

## Eynika Virginia Woolf

Divê jin binivîsin da ku nivîs bibe terapiyek ji bo derketina pêvajoyên trawmayan. Binivîsin ku ew êş û derûniya wan a xirab derbasî keçên wan nebin, di heman demê de kêfxweşî û serkeftinên xwe jî binivîsin ku keçên wan bi xwe bawer bin xwedî mafên xwe derkevin... *Derya Ozdemîr / R.2*



## Hoy Mamo!

Van rojên salyada 100 saliya temenê te bû. Heke wê êvara bêyûm, li wê koçeya kambax, wan destên tarî, ew guleyên bêbext li bedena te ya westiyayî nehatibûna reşandin. Belkî me 100 saliya rewşenbîriya te bi hev re pîroz kiriba... *Încîl Selçûk / R.7*



## Şopa hin şahidan

Carna berhem ji berhemdar çêtir helwest digire, carna berhemdar ji ber tirs, nezanî, dilnewazî û dibe ku hin sedemên din hin gotinên wisa dikin ku dilê xwîner nazwaze qebûl bike ku wî/wê berhemdara gewre gotineke bi wî rengî kiriye... *Rojda Yaşîk / R.8*


Rojnameya Heftane

# xwebûn

www.xwebun.org

29 Hezîran - 5 Tîrmeh 2020
Hejmar: 28
Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org


## Mîtolojî û Helbest

Di helbesta Kurdî ya klasîk de hêmanên mîtolojîk wek mazmûn xuya dibin ku ew jî xasyeteke helbesta klasîk e. Di wan helbestan de hêmanên asîmanî û xwezayî, afirîdeyên dersirûştî, lehengên mîtolojîk yên rojhilata navîn û mîtolojiya îslamî li gor wateyên nêzikî halên xwe yên resen û bi alîkariya hin huner û şêweyên gotinê yên edebî xuya dibin. Di helbesta modern de lehengên mîtîk... *Samî Hêzil / R.5*

## Di 44 salan de 77 berhem nivîsand

Nivîskar û berhevkar Hîlmî Akyol 44 sal in berhevkariyê dike û heta niha bi giştî 77 pirtûkên wî hatin çapkirin. Akyol têkildarî xebatên xwe ji rojnameya me re axivî û wiha got: "Hewcedarî bi xebatek bi rêk û pêk heye. Nizanim sedem çi ye lê sazî û dezgehên kurdan hê jî qedir û qîmetek baş nedane berhevkirina zargotinê. Hele hele siyasetmedarên me ji xwe haya wan ji van xebatan nîne. Zargotin heye tune ye xema wan nîne. Ji hezarî yekê girîngiya ku didin siyasetê, bidana berhevkariya zargotina kurdî niha bi sedhezaran berhem derketibûn holê. Kesên ji nava me bar dikin û diçin û vê gencîneya zengîn bi xwe re dibin. Ji min re berhevkirin pir girîng e."... *Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / RÛPEL - 4*



# Li çar alî dijminatî




Li çar aliyên Kurdistanê dijminatiya li hemberî kurdan zêde dibe. Li başûr û rojavayê welat bi balafiran sivîl tên kuştin, li Rojhilat girtî tên darvekirin û li Bakur piştî binçavkirina bi dehan kesan deriyên avahiya KCD'ê hat mohrkirin. Rojnameger Bestoon Khalîd ku rojnameger Cuneyt Ozdemîr hevpeyvîna wî sansûr kiribû wiha got: Ne bi 'terorê' re bi kurdan re têdikoşin. Berdevkê Serokkomariyê Îbrahîm Kalin li hewara wan hat û got ku êrîşên li hemberî kurdan startejiya Serokkomar Recep Tayyîp Erdogan in û dê erîş berdewam bikin... *RÛPEL - 3*

## Derzîya Çeloka

Di ilmê jinên navsere de; ji roja ku ji yekê re çêdibe, tasekê mişt av dike û vê derzîyê çil rojî di nav avê de dimerdîne û piştî çil roj diqedin ava wê ya tilsimdar û pîroz dirûkîne da ku cinên dora wê biçelqin û birevin, wek çawa siwarên fal û xas fincana serbixwîn dikin gulpek. Her wiha ev pêbawerî di nav xwe de çend rîtualên seyr vedihewîne û bi şiklekî şanogerane zindî li ber çavên me zarokan dihate lîstin... *Ciwan Qado / R. 5*

## Hîna dengê wî zindî ye

48 sal bi ser wefata hunermendê kurd ê navdar Hesen Zîrek re derbaz dibe. Hesen Zîrek di serdemek gelek zehmet de bi hunera xwe têkoşînek mezin daye, êş û zehmetiya gelê kurd bi gotina stranan aniye ser ziman. Ji bona wê çendê ye ku piştî 48 salan hîna jî di dilê gelê kurd de zindiye û ji bo gelek hunermendan jî bûye çavkaniya hunerê. Hesen Zîrek di tevahiya temenê xwede hezar û 500 stran tomar kiriye... *R.11*



## Mîr Mihemedê Rewandizê

Mîr Mihemed, him ji bo rizgariya netewa xwe him jî ji bo yekitiya netewa xwe, nêzê bîst sal şer kiribû. Eşîrên ku ji rizgariya gelê xwe vêdetir, ji ber aborî û desthilatdariya xwe ji Osmanî û Îraniyan qut nabin... *Abdurrahman Sever / R.6*

## Ji bo Cizîrê banga hişyariyê

Piştî 'pêvajoya asayî' ya ku ji hêla Wezareta Tenduristiyê ve di 2'yê hezîranê de hat ragihandin, li navçeya Cizîrê ya Şirnexê nexweşiya vîrûsa korona (Covîd-19) belav dibe û hejmara pêketiyan zêde dibe. Rêxistinên HDP'ê û DBP'ê ji bo balê bikişînin ser rewşa berbelavbûna koronayê li ber avahiya HDP'ê ya Cizîrê daxuyaniya dan. Di daxuyaniyê de li dijî koronayê gelê Cizîrê hat hişyarkirin ku divê bi xwe tevdirên xwe bigirin.

## Îfade û wate di siyê de ye

Têl jî yek ji wan amûmaran e ku bi destên hunermendan veduguhere berhemekî hunerî. Peykerên ku bi têlan an jî bi hesinan tên çêkirin di nav beşa hunera nûjen de cihê xwe digire. Hinar Daşgin yek ji ew kesan e ku bi têlan hunerê diafirîne. Daşgin ji me re qala destpêk û çîroka peykerê xwe kir... *R.11*



# Eynika Virginia Woolf

**Divê jin binivîsin. Mijar çi dibe bila bibe cure çi dibe bila bibe, bila jin binivîsin; da ku zanibin ew ne tenê ne ji çîrok û nivîsên hev hêzê bigirin û ew yek bibe sedema serkeftin û bixwebaweriya jinan**

**Derya Ozdemîr**

Qurana yek ji kitêbên pîroz ên bawermendan e, bi vê ayetê dest pê dike: Bi navê Xwedayê dilovan "bixwîne". Lê dema mirov li ayetê bi xwe binêre tê wateyên 'vekirî, şop, îşaret, nîşane'yê. Di quranê de Xweda bi şop û nîşaneyan rê nîşanî mirovan dide û nîşaneya destpêkê jî "bixwîne" ye.

Ev mijar ji bo jinên xwedî bawerî û bêbawerî jî derbas dibe. Şop û nîşaneya têgihiştina jiyanê ya ewil xwendin e lê şop û nîşaneya watedarkirina jiyanê jî nivîsandin e. Nivîs ji bo jinan ne tenê çalakiyeke entellektuelî ye, nivîs rêyeke îspatkirina hebûna xwe ya civakî ye. Nivîskara jin a îngilîz Virginia Woolf, beriya sed salî ev pirsgirêka jinan dîtiye û pirtûka xwe ya bi navê 'Odeyeka Aidî Xwe' de bal kişandiye ser vê mijarê. Woolf, di vê pirtûka xwe de jinan wekî eynikekê pênase dike.

Di van demên dawî de gelek civaknas û nivîskar jî jinan wekî eynika civakê nîşan didin. Azadî, nirx û mafên civakê li ser azadî, nirx û mafê jiyanê dinirxînîn. Lê eynika civaknasan û eynika Woolf ne heman eynik e. Eynika Woolf eynikeke bi efsûn e û Woolf jinê weke eynika xwe ya efsûnî dinirxîne û dibêje "bi sedan salan e jinan cihê eynikekê girt û hebûna zilaman (mêr) jî du qat mezintir da xuyakirin. Ev eynik eynikek biefsûn bû. Ger ne hêzeke bi vî awayî bûya, dinya hîn hemû pêngav û daristanên darnebirî bûn û ji qadên şeran xeberên serkeftinê nedihat bihîstin. Çar û mîran ne tac li xwe dikirin ne jî ji wan textên xwe dihatin xwarê." Bi van gotinan nirxandina xwe didomîne: "Ji ber van sedeman e Napoleon û Mussolini di kêmtirbûyîna jinan a li gorî zilaman de ewqas israr dikin. Ku jin ji mêran ne kêmtirbûna ew bi xwe ewqas mezin nedibûn." Belê di eynika Woolf de, jin hetiye binpêkirirn û zilam li ser jinan bilind bûne. Lê divê jin êdî vê eynika efsûnî bişikînin û maskeyên zilaman daxînin, deq û dolabên wan aşkera bikin. Ji bo şikandina eynika efsûnî jî hem ji aliyên pêdîviyên debarkirina jiyana xwe hem jî ji aliyê ferasetê ve divê xwe ji zilaman rizgar bikin, bêyî xema gelo zilam dê li ser çi bifikirin divê binivîsin û neşibin zilaman. Ev rewş jî bi nivîsê û xweîfadekirinê pêkan e.

Dîroka jinan jî wekî dîroka gelê bindest nehatiye nivîsandin. Dîrok, dîroka serdestan û ya



mêran e. Divê jin dîroka xwe ji nû ve binivîsin û dudiliyên wekî beden û hiş, qadên taybet û qadên civakî ji holê rakin. Bi ruh û hiş li malê û nav civakê bi îradeya xwe, fikir û ramanên xwe, hestên xwe, beden û xwezaya xwe û bi tevayî HEBÛN'a xwe bide qebûlkirin. Ji bo nifşên nû, ji bo civakeke nû ava bikin û di wê civaka nû de jin; bi awayekî azad, xwedî îrade û serkeftî be, divê xwedî roleke çalak be. Di rêberiya zanista jineolojiyê de di hemû qadan de aborî, tenduristî, teknîk, zanîn, siyaset, estetîk, çand, huner û civaknasiyê de divê jin binivîsin. Ji bo jin û dinyaya jinê bi qedr û qîmet bibin; hêma, têgeh û şaşiyên wêje, dîrok û zanîna pozîtîvîst nedomînin û bandorê li keç û xortên endamên civaka nû nekin.

Divê jin binivîsin, mijar çi dibe bila bibe, cure (çîrok, raborî, wêje, zanîn, felsefe, ger, roman, bîranîn, biyografî) çi dibe bila bibe bila jin binivîsin; da ku zanibin ew ne tenê ne, ji çîrok û nivîsên hev hêzê bigirin û ew yek bibe sedema serkeftin û bixwebaweriya jinan.

Divê jin binivîsin, da ku ji nivîsan re tenê nebin mijarên weke hezkirî, dayik, xwişk, namûs, kevneşopî, kuştin û alîkarên zilaman...

Divê jin binivîsin da ku nivîs bibe terapiyek ji bo derketina pêvajoyên trawmayan; binivîsin ku ew êş û derûniya wan a xirab derbasî keçên wan nebin, di heman demê de kêfxweşî û serkeftinên xwe jî binivîsin ku keçên wan bi xwe bawer bin, xwedî maf û azadiyên xwe derkevin û bi hêz bin.

Divê jin binivîse da ku dem û dîrok şahidiya hebûna hest, hiş û laşên wan bike ku înkarkirin, durûtî û qirêjiya civakê aşkera bibin.

## Sûc û ceza

*Mizgîn Ronak*

*Me tu bi çend quruşên*
*mezinbûnê firot ey zarokatî*
*pepikên te yên sor jî neman*
*qocoxê te yê kesk jî*
*me tu li ser lingek firot*
*pepikên sor ji pişt derî*
*qocoxê kesk jî bin masê derketin*
*em teslîmê qereqola mezinan bûn*
*me li ser hev îfade da*
*me li ser te îfade da*
*pepikên sor jî hatin teslîmkirin*
*bebik, erebok û lîstik jî*
*em ji paş perdeyên şevê derketin*
*û me berê xwe da qereqolê*
*ey zarokatî, me bibexşîne!*
*me hev jî kuşt hevokan jî*
*ne, gulêvar man*
*ne kêvroşk*
*me tu di bin nelên*
*hespên mezinan de tune kir*
*ev hem sûc hem jî ceza ye ji me re*

Min wiha gotiye di helbestek ji helbestên xwe yên dawî de lê sûc û ceza dikare bibe eynî tiştî? Bersiv erê ye. Lew carna dibêjim ku welat jî hem sûc hem ceza ye ji bo me. Sûc e, ji bo ku bi hezaran salan e, digel tevî serhildan û berxwedanan jî bindest maye, me nekariye wî jî xwe jî rizgar bikin. Bi vî awayî ceza ye jî. Lew wekî jan û êşa genetîk, di rehên me û jiyana me de digere lê zarokatî? Ew çima û çawa dibe sûc û ceza? Mezinbûn mesela, sûc e lê xeyala zarokatiyê ya pêk hatiye jî. Kîjan mezin nabêje "Xwezila dîsa zar bûma/pêxas û bêşal bûma" (Silav li gorbihuşt Aram) û kîjan zarok nabêje: "Ez ê kengê mezin bibim, çima ez zû mezin nabim?" Niha em ê bêjin; "Temam, vana rast in lê li ku yê vê rastiyê sûc û ceza ye? Ev jî rast e. Belkî bi hezaran navên vê rewşê yên din jî hene û ez ê jî demek paşê navên din bibînim. Lewre 'rastî' jî diguhere navên wê jî. Tu nivîskarek piştî demekê nikare nebêje; "Ev çi ye min nivîsandiye, çima ewqas seranser e?" Lê niha ji min re wiha tê. Di van rojên koronayî de dîsa çavên min bi pey ewrên ku tam naxwiyên ketin û çûn. Hozanek gotiye ku "ewr, serseriyên asîman in." Rast e têra xwe digerin, ne derdek ne bendek. Herhal tenê ew –ewr- nizanin ku sûc û ceza çi ye. Lê em bi hezar cureyî dibînin, dizanin. Lew wekî pelên weşiyayî ne em li ber lehiya demê, me dibe û dibe. Ger em karibin ji vêya jî sûc û cezayek derxin, em ê bibêjin; "Kê ji te re got, bibe pela weşiyayî û bi ser avê bikeve, ev sûcê te ye lê bûye cezayê te jî..."

Wayê me wiha got lê di meseleya çêbûn û hebûnê de jî qefesa sûc û ceza mirov heps bike jî nikare bisekinîne. Lew bûyînek bêdawî ye, kes nizane ku em hezar sal berê kî û çi bûne û em ê hezar sal paşê kî û çi bin...

Wekî ku ev nivîs hinek bi kesamet û waswas e ne? Çi tê devê pênûsê dinivîsîne û belkî sûc û cezayê wê jî ev e. Loma jî bila bi helbestek xwe ya din xatir ji we bixwaze:

*Me got qey çavgirtok e*
*me xwe veşart*
*lê hê jî didome*
*ne sobe!*
*ne dîtin...*
*Em hemû winda ne*
*em di çavgirtokê de*
*hepsî û winda man welato*
*kanê sobe/kanê gihîştin*
*kanê dilşadî*
*Me got qey çavgirtok e*
*me xwe veşart*
*lê kesê nehat me nedît*
*em hê jî winda ne*
*ma qey çavgirtok wiha ne?*

## 'Farqîna me' ne tenê warê 'bav û kalên' me



**Biyan**

**Munewer Azizoglu Bazan**

Rexneya li ser dîroka nivîsandî ya serdest ku bi giştî dîroka mêran e, ji hêla jinan/femînîstan ve bi îroniya "his(s)tory" (dîroka wî/nêrza) bi gelek awayan hat teşhîrkirin. Yên şaristanî ava kirin û hilweşandin, împaratorî û dewlet damezirandin, şer û pevçûn bi rê ve birin; yên binketin, yên bi ser ketin her tim mêr in. Jin di vê dîrokê de -wek kena bi tinaz a li keviya lêv- bi nivdevkî tên bilêvkirin. Ne tenê jin, her wiha gel û neteweyên bindest; ol, çand û civakên ne di xeta serdestan de ne jî ji gotin û kelamên xuyakirî bêpar man. An jî rastiya wan hat berovajî kirin, çewt û şaş hatin vegotin. Bêguman di pirtûka serdestan de cih negirtin, an jî çewt cih girtin tiştekî ye; li dijî vê dîroka xwe bi xwe nivîsîn tiştekî din e.

Ev rexneya giştî ya li ser dîrokê dikare di gelek beşan de cihê xwe bigire. Ne tenê dîroka giştî, dîroka bajaran jî dîroka mêran e. Mirov bala xwe bidê, li nivîsên li ser bajaran yên bajaran ava kirine (xerab kirine û şewitandine), niştecih bûne, bi rê ve birine, li ser helbest û çîrok nivîsandine tim mêr in. "Kesayetên dîrokî" yên bajêr ji polîtîkayê bigire heta huner û aboriyê, ji dînê wî bigire heta qerfokên wî tev mêr in. Mirov li nav rûpelên dîrokên bajaran bigire - serdem çi dibe bila bibe- ji Atînaya dema Antîk dernakeve. Jin ne mirov in ne jî xuya ne; bê nav in. Bi hemû wateya peyvê "yên bi sê tip" in!

Ligel rexneya nexuyakirina jinan di dîroka bajaran de hin însiyatîfên jinan li gelek deveran dest bi lêgerîna dîroka jinan kirin. Li kolan, qad û avahiyên bajaran ketin dû şopên jinan. Diviyabû jin xwe ji zincîrên nexuyakirinê xelas bikin û ji nav şikeftên veşartî derkevin. Û ji bo vê yekê jî divê dîroka bajaran ji çarçoveyeke nû bê şirovekirin û nivîsandin. Lewre wekî hemû bûyerên civakî di pêşketina bajaran de jî ya bandorê li ser rêgez û bûyeran dike têkiliyên zayendî ne. Tu deverekê bajêr bêyî rastiya rola zayenda civakî nikare bê şirovekirin.

Nûtirîn dokumentarekî di derbarê Farqînê de li ser medyaya civakî hat weşandin. Hunermend Farqîn Azad û komek nivîskar û hunermendên farqînî dokumentara bi navê "Farqîna me" bi armanca danasîna cih û kesayetên dîrokî yên Farqînê amade kirine. Her çiqas ev xebata giranbuha bi taybetî di hêla dîroka xwebilêvkirinê de layiqê pîrozkirinê be jî, di çarçoveya perspektîfa zayenda civakî de hêjayî çend rexneyan e. Madem me pênûsa xwe girtiye destê xwe û ketine heyra nivîsandin û xuyakirina dîroka xwe, divê teşe û awayê nivîsandina me ji ya serdestan cudatir be.

Rastiya ku jin di dîrokê de ji qadên vekirî hatine dûrxistin, bê hay û bay mane, bê nav û şan mane, bi avabûna bajaran/wargehan dest pê nekiriye bêguman. Lê mixabin ne bajar be jî, şiroveya ser bajêr me hevkarê vê gunehê dike. Niştecihên bajêr kî ne? Nirxên ku bajarekî 'dîrokî û qedîm', 'dergûşa çand û hunerê' dikin, kî/çi ne? Kedkarên berhemên avahiyên dîrokî kî ne? Bîra civakî ya bajêr li ser keda kê heta niha xwe parastiye? Êş û xema bajêr kî dikişînin? Ev çend pirs dê derfetê bidin ku em karibin bajarê xwe ji xeynî 'şexsiyetên dîrokî' jî pênase bikin. Şiroveyên ser bajaran jî wek îluzyon in. Ango li gorî 'kî ji kîjan perspektîfê' lê dinihêre diguhere. Ya pêwîst ew e ku mirov karibe van perspektîfên cuda bi harmoniyekê û hevûdu temamkirî pêşkêş bike. Yê ku Farqînê dê bi rastî 'rengîn' bike, ev e. Farqîn bi hemû niştecih, jin, zarok, mirtiv, gerok, macir, koçber û ermenên xwe 'rengîn' e. Yê ku bajêr bi ruh û can dike, avahiyên wî bi wate dike jiyana wî ya civakî ye. Nivîskar Rojen Barnas di pirtûka xwe ya bi navê 'Farqîn'ê de beşeke bi sernivîsa 'jiyana civakî' nivîsandiye. Bêyî ku rola jinan binxêz bike, mînakên jiyana civakî yên li Farqînê daye nasandin. Li vir kevneşopiyên niştecihên Farqînê, bîr û baweriyên wan ên bi hezar salan û têkiliyên wan ên bi hev re bi balkêşî derdikevin pêşberî me. Ger dawet bêyî mirtivan bên şirovekirin kêm e; ger dermankirina nexweşiyê bêyî çanda pîrikan bê şirovekirin kêm e; ger karên bi hevkarî bêyî rola jinan bê şirovekirin kêm e; ger çarşema reş bêyî çanda Êzdayetî û Zerdeştî bê şirovekirin kêm e; ger baweriyên gelêrî bêyî têkiliya wan a bi xweza û mirovan re, her wiha çanda xwedawendaniyê bê şirovekirin kêm e. Bi gelemperî yên ku bajêr dike jîngeh, vê jiyana civakî ye ku bingeha xwe ji civakbûna jinê digire.

Gotûbêjên ser Siyabendê Silîvî bê Xecê, Zembîlfiroş bê Xatûn, Siyahpoş bê Dîlber, xeberoşk û zargotin bê bêjerên jin; Malabadê bê Rindêxan; kaniyên Farqînê bê ciwanan, Mizgefta Belediyê bê paşeroja xwe ya Dêra Ermenan û kolan bê lîstikên zarokan kêm in. Ji ber vê yekê ye ku gotina warê 'bav û kalan' bê 'dayik û pîran' hem kêm e, hem jî ne di cih de ye. Bila kes xwe nesipêre gotinên wek 'ev biwêjên bi sedan salan in û di nav gel de wisa rûniştine'. Biwêj e, lê bîrdoziya mêr temsîl dike. Çanda 'dayik û pîran' bi hezaran salan jî çanda bav û kalan mezintir û qedîmtir e. Jin hem niştecih, hem avakir hem hemwelatî û hem jî dozgerên warên xwe ne. Layiqê nav û şan û xuyakirinê ne.

## Xweşkanî



Felemez Ulug

# Kurd bi tenê hiştin

Dewleta tirk êdî bê hesab û bi çav sorîyek mezin êrîşî kurdan dike. Ev êrîşên bingeha xwe ji dijminantiyê digirin, bi tu awayî pirsgirêka heyî çareser nakin. Di pêvajoya desthilatdariya AKP'ê de dewleta tirk ne di nav sînorê bakurê Kurdistanê de li her çar perçeyên Kurdistanê û derveyî welêt de bi awayekî pir qirêj êrîşî kurda dike. Ev êrîşên li ser kesên sivîl di hiqûqa navneteweyî de sûc e.

Bi van êrîşan ve derdikeve holê ku têkoşîna li himberî dagirkeriya dewleta tirk, pêwîst e li her çar perçeyên Kurdistanê bi awayekî hevpar bê meşandin. Ji ber ku ev êrîş li ser axa Kurdistanê yekser kurdan hedef digirin, wê di demeke pêwîst de li gorî van êrîşan berxwedanî û têkoşînek hêja bê meşandin.

Destûra van êrîşan ji hêla hin hêzên navneteweyî ve hatiye dayîn. Ger dewleta tirk destûr wernegirtibe, ne gengaz e ku bikaribe wisa bi hesabî êrîşan bike. Di van êrîşan de biqasî dewleta tirk hêzên navneteweyî jî tewambar in.

Li gorî peymanên navneteweyî bombebarankina kesên sivîl ango cihên sivîl sûcê mirovahiyê ye. Lê li rexmî ku hemû kes dizanin li wargeha penaberan a Mexmûrê bi temamî kesên sivîl dijîn jî, li himberî van êrîşan ker û kor û lal in. Qaşo wargeha Mexmûrê di bin berpirsiyariya Netewen Yekbûyî de ye. Ger berpirsiyarî û parastin ev be wê demê ev çi hal e.

Erîşên li ser Mexmûrê û Rojava tên kirin, êrîşên siyasî ne. Tu eleqeya van êrîşan bi hebûneke leşkerî ve nîne. Dewleta tirk bi van êrîşan ve dixwaze di qada navneteweyî de hebûna kurdan tune bike. Ji bo bigihîje vê armanca xwe jî di nav lîstikek pir qirêj û kirêt de ye.

Dewleta tirk dijminê gelê kurd e. Lewma di her firsendê de bi çavsoriyek mezin êrîşî kurdan dike. Di van êrîşan de û di dijminatiya tirkan de mijara ku hayê famkirin ango nayê qebûlkirin hevkariya PDK'ê ye. PDK çiqas xulamtiyê ji celadê xwe re bike jî wê tu carî nebe hevalê celad. Ger rojekê ew jî têkeve ber destê celad, wê celad nebêje "ev hevalê min e" û wê celad karê xwe bike. Tişta îro PDK dike jî ev e. Dixwaze hevaltiyê bi celadê birayê xwe re bike û xwe xelas bike. Lê ev ji bo wê nabe xelasî. Ji milekî din ve ev dibe xulamtî.

Ji ber PDK di vê astê de bi dewleta tirk ve hatiyê girêdan, ne gengaz e ku bikaribe li himberî van êrîşên li ser gelê başûrê Kurdistanê tên kirin jî, bibe xwedî helwest. Kesên xwedî îrade û di ruhê wan de têkoşîn heye, dikarin li himberî zilm û zordayê helwesta xwe raber bikin. Kesên xulam ên mîna PDK'ê jî encax li hemberî wan bejna xwe bitewînin.

Hemû êrîş bi hev ve girêdayî ne. Yek armanca van êrîşan heye, ew jî şikandina îradeya têkoşîna Kurdistana azad e. Ger li hemberî van êrîşan gelê kurd bi îradeyek mezin têkoşîna xwe ya berxwedanê mezin bike, wê demê dê ev êrîş negihîjin armanca xwe. Em ji bîr nekin ku faîlê van êrîşan ne tenê dewleta tirk e. Ew hêzên di Lozanê de Kurdistan perçe kirin, niha ji bo gelê kurd negihîje armanca xwe di nav tifaqê de ne.

Lewma li hemberî van êrîşan gelê kurd bi tenê dimîne. Bi vî rengî dixwazin kurdan terbiye bikin. Ji ber vê yekê sozên hêzên navneteweyî didin, kurd jî hemû demkî û ne cidî ne.

# Armanca dijberiya yekitiyê têkbirina kurdan e

**Piştî dayîna peyamên yekitiya di navbera kurdan de, planên têkbirina kurdan hatin lezgîntirkirin. Divê kurd jî li dijî van planan hewldanên xwe yên ji bo serkeftinê zêdetir bikin**

Qedrî Esen

Tirkiye, dijberî û êrîşkariya xwe ya li hemberî kurdan didomîne. Herî dawî piştî ku bi rizaya netew û baweriyên din, li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, hêzên kurd Partiyên Yeketiya Niştimanî ya Kurdî (PYNK) û Eniya Niştimanî ya Kurd li Sûriyeyê (ENKS) li ser yekitiya neteweyî li hev kirin, Tirkiyeyê êrîşên xwe yên li hemberî kurdan berfirehtir kir. Ev berfirehkirina êrîşan, di nav kurdan de weke bersivdayîna yekitiya kurdî hat dîtin.

Di vê çarçoveyê de roja ku lihevkirina yekitiya kurdî hat ragihandin, Tirkiyeyê jî bi hinceta hebûna PKK'ê ya li wir bi dehan balafiran êrîş bir ser başûrê Kurdistanê. Di vê êrîşê de wargeha Mexmûr, Şengal û Qendîlê bombebaran kir. Piştre êrîşên xwe yên bejahiyê yên li vir jî zêdetir kir û hin hêzên xwe li Heftanînê bi cih kirin. Ji vê rojê ve bi taybetî herêmên girêdayî Silêmaniyê lê bi giştî gelek deverên başûrê Kurdistanê ji aliyê balafirên şer ên Tirkiyeyê ve tên bombebarankirin û xelkê sivîl tê kuştin.

Li gorî daneyên dawîn di van êrîşên Tirkiyeyê 9 welatiyên sivîl hatine kuştin û gelek kes jî birîndar bûne. Ji ber vê sedemê li herêmê li dijî operasyonên Tirkiyeyê gelek bertek hene. Heta di nav Hefteyê li Şeladizê gel rabû raperînê û li dijî êrîşên Tirkiyeyê bi awayekî zelal bertekên xwe raber kirin. Li gel van bertekan jî Tirkiye navber nade êrîşen xwe, her roj dijwartir dike. Ji ber vê helwesta wê di navbera wê û welatên ereb de jî, pirgirêkên dîplomatîk derketibûn.

### Çapemenî alîgirê êrîşan e

Li gel vê rewşa xeternak jî ev mijar di çapameniya alîgir a AKP'ê de baş cih nagire û bi awayekî berovajî agahiyên li vir tên dayîn. Mînak, kesên sivîl ên li herêma operasyonê di êrîşan de jiyana xwe ji dest dane weke endamên PKK'ê tên dayîn. Dîsa bi dîmen û wêneyên arşîvê rewşê radigihînin, lê li gel vê yekê jî weke ku dîmen û wêne yên niha bin bi kar tînin. Rojnamegerê tirk ê bi navê Cuneyt Ozdemîr, di nav hefteyê de qaşo ji bo ku vê rewşê ji holê rake, ji başûrê Kurdistanê rojnamegerekî kurd girt weşana xwe ya li ser Youtubeyê û xwest rewşa li herêmê jê werbigire.

Rojnamegerê kurd Bestoon Khalîd, di weşanê de rewşa li herêmê rasterast ragihand û got ku di operasyonên Tirkiyeyê de sivîl tên kuştin û ji ber vê sedemê gelê herêmê operasyonên Tirkiyeyê ne li hemberî PKK'ê li hemberî xwe dibîne û gelek bi bertek in. Ji ber ragihandina vê rastiyê, Ozdemîr weşana xwe ya bi Bestoon Khalîd sansur kir û ji weşanê rakir. Ev hewldana Ozdemîr li ser medya civakî bi awayekî tund hat pêşwazîkirin. Gelek kesan rexne li Ozdemîr kir û destnîşan kirin ku çapameniya tirk alîgiriya êrîşan dike.

### Li Bakur rengê êrîşan cuda ye

Li bakurê Kurdistanê jî rewş ji başûrê Kurdistanê ne cudatir e. Êrîşên leşkerî yên li Başûr, li Bakur dibin êrîşên siyasî ango bi navekî din dibin operasyonên siyasî. Di nav hefteyê de li dijî kesên ku li ser navê kurdan siyasetê dikin, operasyonên siyasî hatin kirin. Di van operasyonan de polîsan bi ser Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) de girt û ji sazî û dezgehên kurdan bi dehan kes hatin binçavkirin. Hevseroka KCD'ê Leyla Guven bi gotina 'em ê serî netewînin' li dijî operasyona li hemberî kongreya xwe derket û got ku ji bo lêdana kurdan pêdiviya dewletê bi belgeyan tuneye.

Bi rastî jî weke ku Guven jî destnîşan dike, ji bo serdegirtina mal û saziyên kurdan pêwîstiya dewletê bi belgeyan tuneye. Lewre tu liv û tevgera kurdan a ji bo maf û destkeftiyên wan ji aliyê dewletê ve nayên nasîn. Nenasîn belgeya 'herî mezin' a êrîşan e. Jixwe qanûn jî ji ber ku ji aliyê kesên ku êrîşê dibin ser kurdan ve hatine amadekirin, di vê mijarê de baş hincet didin destê êrîşkarên kurdan. Êrîşên ku pek tên bêguman qanûnî ne lê teqez ji heq û hiqûqê dûr in.

### Stratejiya Erdogan!

Ji bo xurtkirin û geşkirina van êrîşan siyasetmedarên tirk jî tişta ji destê wan tê dikin. Wezîrê Karên Derve Mewlûd Çavûşoglû ku ew bixwe jî bi eslê xwe kurd e û serokê giştî yê MHP'ê Dewlert Bahçelî, bi gotinên gelek tund li dijî yekitiya di navbera kurdan de derketin. Yekitiya kurdan weke îxanet bi nav kirin û gotin ku tevgerên kurd ên li gorî daxwazên wan tevnegerin di hedefa wan de ne û dê her êrîşê bibin ser wan. Berdevkê serokkomariyê Îbrahîm Kalin jî li hewara wan hat û got ku êrîşên li hemberî kurdan stratejiya serokkomar Recep Tayyîp Erdogan in û dê eriş berdewam bikin.

Bi van êrîşên leşkerî û peyamên siyasî xuya dibe ku di rojên pêş de hewldanên hilweşandina yekitiya di navbera kurdan de zêdetir bibin. Lewre pêkhatina yekitiya di navbera kurdan de tê wateya têkçûna planên Tirkiyeyê yên li herêmê. Yekitî kurdan dikare bike xwedî statu. Ev jî tê wateya têkçûna stratejiya Erdogan a Îbrahîm Kalin tîne ziman. Heke dijberên kurdan di nav planên têkbirina pêşeroja kurdan de bin divê kurd jî teqez hewldanên xwe yên serkeftinê zêdetir bikin.





## Dozger şandina cenaze ya bi PTT'ê asayî dît

Di 10'ê nîsanê de Serdozgeriya Komarê ya Dêrsimê, cenazeyê Egîd Îpek bi rêya qargoyê ji malbata wî re şandibû. Dayika Îpek Halîse Aksoy, li şûna morgê cenazeyê kurê xwe ji PTT'ê girtibû. Wêneyên vê sosretê ku bi çapameniyê re hatibûn parvekirin, wê demê bûbûn sedema bertekên tund û gelek derdoran bertek nîşanî AKP'ê dabû. Halîse Aksoy, bi alîkariya Şaxa ÎHD'ê ya Amedê, Baroya Amedê, Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (TÎHV) ya Amedê û Komeleya Hiqûqnasên ji bo Azadiyê (ÇHD) serî li Serdozgeriya Komarê ya Amedê dabû û xwestibû der barê dozgeriya Dersimê de lêpirsîn bê vekirin. Dozgeriya Amedê, serlêdana Halîse Aksoy nirxand û şandina cenaze ya bi qargoyê guncav dît û diyar kir ku "Karê hatiye kirin li gorî rêziknameyê ye." û biryara neşopandina lêpirsînê da.

## Armanca êrîşa li ser gundê Helincê

Ji bilî êrîşên li ser başûr û bakurê Kurdistanê, li dijî gundê Helincê yê Kobanê jî, ji aliyê Balafirên Bêmirov ên Biçek (SÎHA) ve êrîşeke hewayî pêk hat. Di vê êrîşê de 3 jinên kurd hatin qetilkirin. Der barê mijarê de ji aliyê rayedaran ve tu daxuyanî nehat dayîn. Lê di nav kurdan de êrîş bû sedema nerazîbûnê. Li her çar parçeyên Kurdistanê li dijî êrîşê çalakiyên şermezarkirinê hatin lidarxistin. Fermandarê giştî yê HSD'ê Mezlûm Ebdî ji ber êrîşê bertek nîşanî Amerîka û Rûsyayê da û xwest ku pêşî li êrîşkariya Tirkiyeyê bigirin û wê bînin ser xeta peymanên ku îmze kirine. Bi vê êrîşê Tirkiye nîşan da ku, kî dibe bila bibe, li her derê kurd di hedefa wê de ne û dikare wan ji xwe re bike hedef û êrîş bibe ser wan. Dîsa bi vê rêbazê dixwaze li dijî kurdan zextê li hêzên navneteweyî bike û di bin navê 'terorê' de wan bîne cem xwe.



## GOTINÊN HATINE JIBÎRKIRIN DI STRAN Û ÇÎROKAN DE NE

# Zargotina me gencîne ye

→ Rizoyê Xerzî

Mixabin haya siyasetmedarên me ji van xebatan nîne. Zargotin heye tune ye xema wan nîne. Ji hezarî yekê girîngiya ku didin siyasetê bidana berhevkariya zargotina kurdî niha bi sedhezaran behrem derketibûn holê. Her wiha ciwanên me dikarin rojê bi 15-20 lîreyan cixarê bikişînin lê 5 lîre be jî nadin bi pirtûkeke kurdî û naxwînin

*Xwendevanên hêja vê hejmarê jî kedkarekî kelepûra kurdî mêvanê me ye. Vî camêrî, ji ciwaniya xwe ve ji çîrok, destan û dengbêjiya gelê xwe hez kiriye û zêdeyî 40 salan xebatên hêja yên der barê çand û hunera kurdan de berhev kirine. Jixwe dema ku li Amedê behsa van mijaran dibe, di serî de mamoste Hilmî Akyol tê bîra mirovan. De ka em bi hev re li pirs û bersivên der barê xebatên vî kedkarê ziman û kelepûra kurdî de binêrin.*

***Mamoste Hilmî Akyol wekî em dizanin ji ciwaniya te ve çîrok û stranên kurdî bala te kişandiye û heta niha te gelek berhemên hêja çap kirine. Tu dikarî ji xwendevanên me re behsa destpêka xwe ya van xebatan bikî?***

Wekî ku min berê jî gelek caran gotibû; di zaroktiya xwe de min guhdariya gelek çîrok û stran û destanan dikirin. Dema me çîrok guhdarî dikirin û diketin nava ciya, min û xwişka xwe ya mezin heman çîrok dubare dikirin. Ji ber ku min pir ji çîrok û stranan hez dikir. Dema ez bûm şazdeh hevdeh salî, êdî min kaset berhev kirin. Li gorî derfetên xwe min kasetên vala dikirîn û bi çîrok û stranan dadigirtin. Bi salan re li navçeya Hezro, Bismil û Farqînê min li gelek gundan çîrok û stranên dawetê tomar kirin. Min di heman demê de kasetên dengbêjan dikiriyan. Bi vî awayî min domand heya îro.

***Pirtûka te ya yekemîn Senem anim bû ku di sala 2000 'î de ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve hat çapkirin û ez ne şaş bim heta niha 77 berhemên te hatine çapkirin di nava van bîst salên dawî de. Te ewqas destan, çîrok û stran çawa behev kirin û balkêş e ku di demeke kurt de hatine çapkirin?***

Di wan salan de hatine çapkirin lê ya rast, ne di bîst salan de ev berhem hatine berhevkirin. Berhevkariya min a pêşî di sala 1977'an de bû. Ev berhemên hatine çapkirin, berhevkariya 44 salan e. Ji ber ku gelek salên dirêj min berhevkarî kiribû û ji sala 1979'an vir de ji kasetan derbasî nivîsê dikim. Jixwe hatibûn amadekirin. Sala ku Senem Xanim hat çapkirin, deh dozdeh dosya jixwe amade bûn. Lê weşanxaneya ku çap bikirana tune bû. Ji bo çapê gelek pere dixwestin. Derfetên min jî tune bûn ez wan çap bikim. Piştî ku min di şaredariyê de dest bi kar kir, êdî derfetên min ên aboriyê destûr didan ku ez pirtûkên xwe çap bikim. Dosya amade bûn min didan weşanxaneyan wan jî çap dikirin.

***Bi salan e berhevkariyê dikî, heger serpêhatiyeke te ya balkêş hebe ji bo xwendevanên me dikarî behs bikî?***

Erê gelek serpêhatî hene. Lê ez ê du serpêhatiyan bibêjim. Li gundekî navçeya Bismilê min çîrok û stran tomar dikirin. Kurê xalê min feqiyê mizgeftê bû. Feqîtî dikir. Gelek stranên dawetê dizanibû. Min amadekarî kir ku stranên wî tomar bikim. Kurê meta wî hat şûna me, got, "Hîlmî çiqas nehs û fenek e. Stranan ji dengê feqî tomar dike, ji bo ku heke hat girtin, feqî bigirin têkilî Hîlmî nebin.''


Li navçeya Misircê jî em çûn gundê Bînofê. Dengbêjek li wir hebû. Dengbêjek bi nav û deng bû. Em çûn mala wî. Me jê re sedema çûna xwe got. Camêr ji me re got, "Min dest bi sofîtiyê kiriye, ez rojiya xwe digirim, limêja xwe dikim. Ez êdî stranan nabêjim.''

***Li gorî vê rêwîtî û azmûna te ya xebatên berhevkarî û lêkolînên der barê kelepûra kurdî de, ji bo xebateke baş were kirin, hewcedarî bi çi heye?***

Hewcedarî bi xebatek bi rêk û pêk heye. Nizanim sedem çi ye lê sazî û dezgehên kurdan hê jî qedir û qîmetek baş nedane berhevkirina zargotinê. Hele hele siyasetmedarên me ji xwe haya wan ji van xebatan nîne. Zargotin heye tune ye xema wan nîne. Ji hezarî yekê girîngiya ku didin siyasetê, bidana berhevkariya zargotina kurdî niha bi sedhezaran berhem derketibûn holê.

***Zêdetirî 40 sal in bi karê berhevkariyê re mijûl dibî û ji weşanxaneyên cuda gelek berhemên te hatine çapkirin; eleqeya ji bo berhemên te çawa ye?***

Eleqe û xwendina pirtûkên kurdî jixwe pir hindik e. Ciwan rojê 15-20 lîreyê tirk didin cixarê dikişînin.



Lê 5 lîre nadin pirtûkeke kurdî, naxwînin. Yanî çend nivîskar û berhevkarên hêja yên navê wan derketiye pêş, pirtûkên wan hindik be jî tên xwendin lê yên din di ciyê xwe de dimînin.

***Pirtûkên te yên zargotinê bi zimanê axaftinê hatine nivîsandin. Hema kes çawa axivîne te wisa derbasî pirtûkê kiriye, sedemeke vê ya taybet heye gelo?***

Erê sedema herî girîng reseniya zimanê kurdî ye. Eger em ziman ji dengbêj û çîrokbêjan hîn nebin, hew ji pirtûkên fêrbûna ziman hîn bibin, em ê gelek gotinên di zimanê me de hîn nebin. Ji ber ku gotinên bi salan e ji zimanê me derketine an jî hatine jibîrkirin di nav stran û çîrokan de hene. Ji ber vê yekê reseniya ziman girîng e, min jî ji devê wan nivîsand.

***Pirtûkên te yên helbest û çîrokên zarokan ên te bixwe nivîsansine jî hene. Lê berhevkariya te bêtir derketiye pêş, tu vê mijarê çawa şîrove dike?***

Bi sedan kesên hêja hene ku ew bixwe dinivîsin. Lê kesên berhevkar hindik in. Piştî ku elektrîk hate gundan, televîzyon ketin gundan êdî kes çîrok û stranan nabêje. Kesên dizanin roj bi roj ji nava me bar dikin û diçin û vê gencîneya zengîn bi xwe re dibin. Ji min re berhevkirin pir girîng e.

***Wekî dizanim te di bin banê xebatên Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê de jî gelek berhem çap kirin, niha jî xebatên wiha dibin an piştî desteserkirina şaredariyê ew xebat sekinîne?***

Me ji bo şaredariyê deh dosya amade kirin. Pênc pirtûk çap bûn. Piştî desteserkirina şaredariyê em ji kar derxistin. Ew xebat wisa man.

***Niha tu bi çi karî mijûl î û xebatên mala dengbêjan çawa berdewam dikin?***

Mala dengbêjan di sala 2007'an di 30'yê gulanê de vebû. Me li gelek herêman bi kamerayê nêzî sed kasetên dengbêjan tomar kirin.

Antolojiya Dengbêjan 1 di sala 2007'an de çap bû.

Antolojiya Dengbêjan 2 di sala 2011'an de çap bû.

Antolojiya Dengbêjan 3 di sala 2015'an de çap bû.

Antolojiya Çîrokbêj û Destanbêjan di sala 2015'an de çap bû.

Ji Devê Jinan Stranên Dawetê di sala 2015'an de çap bû.

Piştî vana me pênc dosya jî amade kirin:

1- Antolojiya Dengbêjan 4,

2- Ji Dengê Mêran Stranên Dawetê 1 (Notayên stranan hat derxistin.)

3- Ji Dengê Jinan Stranên Dawetê 2 (Notayên stranan hat derxistin.)

Ev berhem wê bihatana çapkirin. Ji ber ku şaredarî hate desteserkirin, nehatin çapkirin. Wisa amadekirî li cem me man.

Her wiha xebatên deng û peyvên wan amade ne jî ev in:

Ji Dengê Jinan Stranên Dawetê 3 (Notayên stranan nehatine derxistin)

Ji Dengê Mêran Stranên Dawetê 2 (Notayên stranan nehatine derxistin)

Wekî din, me li mala dengbêjan di hefteyê de şeş rojan dîwanên dengbêjan çêdikirin. Me dengê dengbêjên ji derveyî Amedê dihatin mala dengbêjan tomar dikir.

***Bi dehan sal berê te dest bi vî karî kir û di nav civakê de gelekî geriyayî û çûyî gelek deveran. Ji wê demê heta niha gelek tişt guherîn, teknolojî bi pêş dikeve û bivê nevê civak diguhere. Dema mirov salên te yên ewil û yên heta niha wek şerîdeke filmê bîne ber çavê xwe di warê ziman, çand û civakî de çi guhertin hene gelo?***

Van salan derfet pir baş in. Bi saya teknolojiyê mirov gelek dengbêj û çîrokbêjan nas dike. Berhevkarî hêsatir bûye, lê di zimanê çîrokbêj û stranbêjên niha distrên de, gelek guhertin çêbûne. Wekî berê çîrokbêjan digot "derketin meydanê'' îro dibêjin "derketin qad û alanê." Êdî cihê civat û şevbêrkan bernameyên înternetê girtine. Dengbêj bernameyên înternetê çêdikin.

***Eger ji bo xwendevanên me peyamên te yên dawîn hebin em werbigirin.***

Di xebatên we de serleftinê dixwazim. Bimînin di xweşiyê de.

***Em jî spas dikin, mala te ava ji bo tu bûyî mêvanê me û te agahiyên der barê xebatên xwe de bi me û xwendevanên me re par vekirin.***

## Hîlmî Akyol kî ye?



Hilmî Akyol di sala 1960'î de li gundê Dersilê yê navçeya Hezroya Amedê hatiye dinyayê. Di heman salê de hîna ew zarokek şeş mehî bûye, ji Hezroyê mala xwe tînin Amedê û heta niha li Amedê dijî. Di dema xwendekariya xwe ya lîseyê de dest bi daneheva kasetan dike û gelek kasetên dengbêjiyê berhev dike. Heta niha zêdeyî 70 pirtûkên wî hatine çapkirin.





Samî Hêzil

# Mîtolojî û helbest

Têkiliyeke xurt û dualî heye, di navbera mîtolojî û helbestê de. Ji hêlekê ve mît –her çiqas wek cureyeke pexşanî, wek çîrok, bên pejirandin jî– xwedî xasyetên derbirîna helbestî ne û tê de gotinên pirwate û zimanekî sembolîk û sazbûneke kompleks wek a helbestê hene; ji hêla din ve jî helbestê timî ji deqên mîtîk, ji çîroksaziya wan û ji tema û figurên wan sûd wergirtine û ji bo îfadeya xwe zengîn bike ew bi şêweyên cihê, bi temsîlên nû ve-şixulandine.

Çîrokên mîtîk, bi taybetiyên xwe yên kompleks û bi temayên xwe yên cihêreng, çavkaniyên xurt ên sembol û metaforan in. Ji ber van xasyetên xwe yên kompleks derfetê didin helbestvanan ku, her wekî Oğuz Cebeci destnîşan dike, helbestvan ji wan metaforên hevedudanî çêbikin. Bi gotina David Punter em bibêjin: Di mîtolojiyê de bê hejmar metaforên mirî hene û helbestvan ji bi wateyên nû wan metaforan vedijînin.

Nader Masarwah diyar dike ku helbestvan wateyên nû ji mîtê didêrin da ku bi alîkariya wan nêrînên xwe yên hemdemî yên der barê arîşeyên jiyanê de bînin ziman. Masarwah bikaranîna helbestvan Adonîs a mîta Sîsîpûs wek mînak şîrove dike û wek encam dibêje ku Adonîs vê çîroka mîtîk ji bo tekoşîna azadiyê û berxwedana gelê Yemenê ji nû ve watedar dike. Di esasê xwe de temaya vê mîtê –ku Sîsîpûs kevirekî pişt dike ta serê çiyayekî bilind û ew kevir dîsa digindire xwarê, bêyî ku bigihîje lûtkeyê– êşkişandina abadîn û hewldaneke domdar e ku axiriyê ew hewldan bi kêrî tiştekê nayê. Lê Adonîs vê mîtê bi awayekî erênî ji nû ve kardar dike û dike sembola têkbirîna astengiyan û afirandina pêşerojeke nû.

Di helbesta kurdî ya klasîk de hêmanên mîtolojîk wek mazmûn xuya dibin ku ew jî xasyeteke helbesta klasîk e. Di wan helbestan de hêmanên asîmanî û xwezayî, afirîdeyên dersirûştî, lehengên mîtolojîk yên rojhilata navîn û mîtolojiya îslamî li gor wateyên nêzikî halên xwe yên resen û bi alikariya hin huner û şêweyên gotinê yên edebî xuya dibin.

Di helbesta modern de lehengên mîtîk, bûyerên mît û dîrokî ji bo hin sedemên polîtîk ên wek afirandina paşxaneyeke dîrokî, tekûzkirina hizra neteweyî û hewisandina endamên wê neteweyê hatine bikaranîn. Her wekî Zulkuf Ergun di berhema xwe ya bi navê Nerît û Helbestê de destnîşan dike, mît li gel dîrokê, ji bo rewşenbîrên kurd ên dawiya sedsala 19'an û seranserî sedsala 20'an navgîneke avakirina fikra neteweyî bû. Rîtuelên wek newrozê, lehengên wek Rustem, şaristaniyên qedîm û keysarên wan ên mîtolojîk tev ji bo diyarkirin û çespandina nasnameya neteweyî hatine derpêşkirin. Ev derpêşî jî herî zêde ji hêla helbestê û helbestvanan ve pêk hatiye.

Mînakên Ergun dide cih û fonksiyona mîtolojiyê ya girîng a di helbesta kurdî de aşkera dikin: *Mîta Tofanê ya ku dibe mijara helbestên Hacî Qadirê Koyî û Ebdurehîm Rehmî Hekkarî; mîta Aryeniyê ya ku helbestvanên wek Lahûtî Xan, Eskerî di berhemên xwe de cih didinê; dîroka medan û pirtûka pîroz a Zend-Avesta ya ku di helbestên Hejar û Cigerxwîn de ji nû ve vedijin*, tev erka destnîşankirinê ya destpêka nijada kurdan tînin cih.

**Matmayînên Ronyayê**


*Matmayînên Ronyayê*, pirtûka mişt mîtolojî ya helbestvan a Lal Laleş mînakek serkeftî ya helbesta mîtolojîk e. Ev berhem wek metneke yekgirtî di avabûna xwe ya poetîk de bi gelek şêweyan li xasyetên mîtê digunce. Metn bi rêya metaforên ku bi fîgûrên mîtolojîk sazbûyî kompozîsyonekê temam dike. Binyada poetîk li ser esasê îmajên mîtîk ava dibe û her fîgûrek girêdayî kakilê wateya xwe ya mîtîk û bi bibîrxistineke têkildarî temayeke nasyar di helbestan de cih digire.

Cihêrengiya tema û hebûnên mîtîk ên ku tê de derpêş dibin ji yezdanan bigire ta afirîdeyên dersirûştî û pê re jî ta lehengan û çîrokên wan temsîleke berfireh radixin pêş çav. Ev cihêrengiya ku tê qalkirin îmkanê dide ji bo avabûna metaforên hevedudanî. Her wisa bi saya serê vê yekê reqabetek metaforîk çêdibe li seranserê berhemê. Bi gotina Oguz Cebeci, “tengejeya ku bi bihevrebûna metaforên dijber çêdibe û vejena ku di encama vê tengejeyê de derdikeve holê hêza esasî ya metafora helbestî derdixîne holê.”

Di Matmayînên Ronyayê de mît, hem bi temsîlên gerdûnî û hem jî bi yên lokal derdikevin pêş me. Temsîla bi figurên mîtê bi Zeûs dest pê dike, pê re Apollo, Hades, Afrodît, malbata ku li Panteonê cîwarbûyî bi rêzeke hiyerarşîk tê de cih digirin. Di pey re lehengên mîtê û bûyerên serdemên qedîm ên nemir tên. Di destpêka metnê de Mêrdîn wek paşxaneya îmajên qedîm derdikeve pêş, li nîveka metnê Çewlig wek temsîla mîta sirûştê û şîroveya ava heyatê û florayê û li dawiyê jî Amed wek dîmena berovajîbûyî ya demê, an ku wek paşeroja li nav îro çikiyayî xuya dibin.

Her wekî Eliade bi têgeha sembolîzma arkîtektonîk a navendê formulîze dike, li her çiyayeke pîroz erd û asîman digihin hev û bi heman awayî her perestgeh an jî bajar jî wek nuqteya hevgehînê ya dojeh, erd û asîmanê ye. Di sêwirana mîtolojîk de bajar wek navendên gerdûnî, ku erdê digihînin asîman û wek pireya sererdê ya navinciyê jêrerd û jorerdê ne. Di pirtûkê de Mêrdîn, Çewlig û Amed wek sê bajarên navend xuya dibin. Di berhema Laleş de ji bilî fîgûrên mîtolojîk ên li jêr hatine qalkirin, her wisa yên wek Ares, Thesee û wargeha rojhilat Alamût jî bi nîşandekên mîtolojîk derbas dibin. Ew jî her wekî yên hatine şîrovekirin bi awayekî têkildarî çîrokên xwe yên resen in, bes helbestvan ew ji bo sêwiran û afirîneriya helbestî bi kar anîne û barên metaforîk ên nû li wan kirine.

Laleş sembolên mîtîk bi tenê ji bo temsîlên civakî naşixulîne, berovajî vê ew di berhema xwe de mîtê di asteke şexsî de, cih bi cih jî ji bo helwesta xwe ya polîtîk bes dîsa bi bergeheke şexsî bi kar tîne. Bi vê taybetiya xwe jî berhem ji şêweya bikaranîna mîtê ya helbesta kurdî ya modernîst vediqete. Matmayînên Ronyayê bi her xwendinê –bes xwendinên bi hemdê xwe– li benda şîroveyên cihê ye.




# Derziya çeloka



Ciwan Qado

Pêbaweriyeke me kurdan a dêrîn heye, pîrejinan ew di guhên kevaniyên malan de dipispisand; kevaniyên ji pisîkan bêtir çêlik dianîn. Li gorî vê kevneşopiyê, çênabe ber devê pîrek û jinikên ku hîn çilê xwe neqedandine, vekirî be. Divê ku bi şala serî nixumandî be û bi derziya çeloka ya bi serê heft ecêban xilqandî be;

"xudana hezar û yek navî
çeka hebûn û xeybê,
destbiraka hemaylok û nivîştan,
cîgira bişkokên ketî,
qufla pêçekê,
çengela şarkê,
xefka cinan."

ev derziya tu dibê di quzê gur de kesidiye!

Bi vî hawî divê ku pidû û rêzikên diranan nexuyên da ku neherifin û nekevin, ji ber ku li vir diranên ketî ne wek ên zarokan in li ser pişta kêzika hecê hilnayên, an di kefenê xwesteka de ji qaşilê sîrê deyn bûne, bi diranên xezalan re nayên guhertin.

Di ilmê jinên navsere de; ji roja ku ji yekê re çêdibe, tasekê mişt av dike û vê derziyê çil rojî di nav avê de dimerdîne û piştî çil roj diqedin ava wê ya tilsimdar û pîroz dirûkîne da ku cinên dora wê biçelqin û birevin, wek çawa siwarên fal û xas fincana serbixwîn dikin gulpek.

Her wiha ev pêbawerî di nav xwe de çend rîtuelên seyr vedihewîne û bi şiklekî şanogerane zindî li ber çavên me zarokan dihate lîstin, wek ku yek çend dîmen ji fîlmên Tarkowsky û Bergman jêkiribin û qusandibin û bê tertîb li kêleka hev danîbin û riqufandibin.

"Çênabe pîrek çilê wan li hev keve û heger bi himber hev bên divê çariyê li dora ser û devê xwe girê bidin û levza wan bi hev nekeve, her yek divê derzîyekê têxe ber serê a din, heger sergirtî bin; heger serqot bin didin dest hev, timî jî çilê a ji derve tê bi a ku li hundir e dikeve û heger dengê a bi çil here yeka din bi çil, eva ku dibihîze nema ducanî dibe, îjar divê here çend peşk mîza xwe a ji ava muqedes parziniye bi ser dîwar û deriyê a ku dengê xwe biriye wê dake ji bo karibe çilê xwe pê re jî bextê xwe kelpîç bi kelpîç bibirre."

Berî çend salan ji şevbestekê şiyar bûm, li gor weşa wê ez li hêwana mala zaroktiya xwe li Amûdê di nav nivînê xwe de bûm, çav li xew bûm. Kesekî li derî dixist û di ber re digot, derî veke ez dixwazim derbasî hundir bibim! Lê li gor xewnê, ew deng ne ji derve bû, di guhê min de bû, di hundirê serê min de bû û saweke bêhawe jî pê ve şirêzkirî bû. Wî kesî dixwest bi zorê derî veke lê min nedihişt, dawiyê ew kes pîrka min derket. Berî bi hişê xwe ve werim ji min re digot, min emanetek ji dêya te re aniye. Lê min nas nekir ew emanet çi bû. Pê re ji xew hilçenîm... min dît dêya min li ber dolaba cil û kincan rûniştî ye û qenewîçek di destê wê de ye, li wê qenewîça di destê xwe de dinêrî, bi ser de diponijî û digot, ecêb e ev dinya law, çawa yek dikare bawer bike destên ku ev paçik dirûtine û neqişandine niha bûne ax û nikare bawer bike ku heman dest li welatê jor derziya çeloka xist ber ew ên ji me çêtir li kirasê wan xist û ew pê xilqandin û di civatê de rûnandin û ew kirin beşer wek min û te. Gelek kesên baweriya xwe bi van çîrokan naynin bav û kalên wan bixwe carekê bi vê derziyê hatine girtin û bûne beşer.

Dinya berê xweştir bû di her malê de, berê cin û ocax hebûn, pêjnên xwe bi çurisîna çavên pisîkan dinixumandin û ku kes li dora meriv tunebana li ber dilê wî didan, diçûn şevbuhêrka wî pê re dîlana tirs û sawêran digerandin û ger meriv dîlangerekî jêhatî bûna, dikarîbû bi derziya çeloka ew yek bi yek zeft kiribana, bi wê zanebûna ku pê berê kew ber bi dafê ve dajotin û dixistin zeftê.

# 'Bi çavê berxwedêran heqîqet bê dîtin'

Çalakiyên li dijî kuştina George Floyd didomin. Li herêmên cuda yên DYA'yê çalakiyên cuda tên lidarxistin; pergala bêedalet û êrîşên nijadperest tên şermezarkirin. Çalakger di çalakiyan de didin zanîn ku divê rastî neyên berovajîkirin

Navenda Nûçeyan

Polîsê spî yê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) di 25'ê gulanê de çonga xwe danî ser stuyê welatiyê reşik ê DYA'yî George Floyd û ew fetisand. Piştî kuştina Floyd, li DYA û gelek welatên Ewropayê bi dehhezaran kesên muxalif daketin qadan û dest bi çalakiyan kirin. Çalakiyên li DYA'ê dest pê kir, li gelek bajar û welatê cîhanê didomin. Çalakgerên ku li bajar û eyaletên cuda tev li çalakiyên "Jiyana reşikan bi qîmet e" bûn, der barê rewşa çalakiyên DYA'ê û sedema tevlêbûna çalakiyên xwe anîn ziman. Çalakgeran li ser girîngî û wateya çalakiyan û siberoja çalakiyan ji Ajansa Mezopotamya (MA) re axivîn.

**'Min rastî anî ziman'**

Li Minneapolisê cihê Floyd lê hat kuştin jî çalakî didomin. Yek ji çalakgeran û wênekêş Canaan Mattson jî ji bo wêne û dîmenên çalakgeran bigire li kolanan e. Mattson, der barê çalakiyan û xebatên xwe de wiha got: "Ez wekî mêrekî reşik, piştî kuştina George xwest şînê bigirim, mirovan bi rêxistin bikim û kuştina reşikan şermezar bikim. Heta niha min qet li taxa xwe nedîtibû ew qas mirov daketine kolanan û polîsan protesto dikin. Min jî wekî wênegirekî xwest bi çavê muxalifan li dijî medyaya serdest rastiyan bînim ziman."

**'Rastî hat berovajîkirin'**

Yek ji çalakgerên li bajarê Minneapolisê ku li ser otobana Interstate 35W'ê hindik mabû di bin tankerê de bipelçiqiya, Adrian Wilson jî sedema tevlêbûna çalakiya xwe wiha anî ziman: "Ez hindik mabû di bin tankerê de bipelçiqim. Vê yekê hêrsa min zêdetir kir. Ez çûm malê û min li Fox Newsê nêrî. Min dît ku rastî berovajî kiriye. Ji bo ku rastî bê dîtin divê rastî bê tomarkirin. Ji ber vê yekê her roj di çalakiyan de me. Ez her roj li kolanan im. Ez li vî welatî her roj rastî lîncên nijadperst têm. Ez mêrekî afrikayî-amarîkayî me. Kurekî min heye. Ez naxwazim tişta hatiye serê min, bê serê wî jî. Divê ev çalakî tu carî bi dawî nebin."

**'Pergala edaletê têk çû'**

Aaron Lucas Graham Pineiro jî wekî psîkologekî li New Yorkê, tev li çalakiya ji hezaran pêk dibe. Pineiro, anî ziman ku di van çalakiyan de êş û hêrs di nav hev de ne û wiha nêrînên xwe anîn ziman: "Mirov êdî nefred dike ku ev bûyer bê serê kesekî ku dişibe te. Êdî tirsek jî heye. Tirsa ku ev bûyer bê serê xizmekî te jî. Çalakiya ez beşdar bûmê, polîsan mudaxaleya pir hişk kir. Min wêne kişandin maşîna polîsan li ser hev 3-4 caran teqiya û şewitî. Ji ber vê tundiyê çalakiyên ez beşdarî wan dibim, rîskê jî bi xwe re tîne. Me her tim wekî mirovên hov û kesên sûcdar dibînin û didin nîşandan. Ev çalakî nîşan dide ku pergala edaletê têk çûye. Em tenê serhildanê dibînin. Ger em di nav pergaleke adilane de jiyabûna, ev serhildan pêk nedihat. Berpirsiyarê vê yekê ne em reşik in. Ev di qada polîtîk, sincî û tekakesî de ye."

**'Armanca vê çalakiyê heye'**

Çalakgerê ku li Manhattanê dijî Alessia Herrera Rockefeller jî qala çalakiyên ku di wî bûn sedema gurhertinê wiha behsa xwe kir: "Ez tev li çalakiyên aştiyane ku dengê zêde bi xwe re tîne bûm. Çalakî ji bo min hest û hêzê zêde dike. Ez wekî jinek spî ya DYA'yî piştgiriyê didim çalakiyên li Manhattan û Brooklynê. Ez bawerim yekemcar kesên piştgiriyê didin çalakiyan ji kesên piştgiriyê nadin çalakiyan zêdetir in. Bi taybetî komên gelek serkeftî li Manhattan û Brooklynê çalakiyan bi rêxistin dikin. Ji ber ku çalakiyên wan bi armanc û bi rêxistin in."



**'Nijadperestî ne nû ye'**

Kyle Scoot jî piştî kuştina Rayshard Brooks yê ku polîs kuşt li Atlantayê tev li çalakiyan dibe. Scoot anî ziman ku li DYA'ê nijadperestî ne nû ye û wiha axivî: "Berê darazê çi gotibûya, ew dihat kirin. Lê niha ji ber pergala edaletê, girtîgeh reşikan tijî kirine. Gelo ger ku kuştina Floyd bi kamerayan nehatibûya tomarkirin dê darazê ew çawa nîşan bida. Gelo dê wekî reşikekî bêsûc û bêçek nîşan dabûya an jî bi şiklekî din bida xuyakirin. Çalakiyên niha ji yên salên 1940-1970'an cudatir in. Niha em mirovên reşik, spî, asyayî û nijadên cuda bi hev re li heman tiştî dinêrin. Em piştevanên he in. Niha tiştê em dibînin şoreş e."

# Berhemên ruhê xwebûnê-2 Mîr Mihemedê Rewandizê

**Abdurrahman Sever**


Êdî baranên demsala payîzê, cihê xwe ji berfa zivistanê re hîştibû. Berf, wek dawiya jiyanê hêdî hêdî rûyê erdê kefen dikir. Lê sar û seqem hê dest pê nekiribû. Mîr Mihemed, bi bejna xwe ya zirav û dirêj, ji paceya menzela xwe, bi xemgîniya dûrmayîna ji welêt, li berfa Stenbolê temaşe dikir. Di her guliya berfê de bi xeyalî diçû rojên berê, salên derbasbûyî û bûyer, êş û elemên qewîmîbûn. Ji kûrahiya xeyala welêt, dengê dengbêjan dihat guhê wî. Her gotina dengbêjan dibû berf û baran li ser dilê wî dibariya. Lê dîsa jî kelecanek hebû li ser derûniya wî û kenên nîvco li ser lêvên wî bû, ji ber ku rêya welêt jê re vebibû û dê di demek pir nêz de bigihîşta axa xwe ya pîroz.

Piştê amadekariyê, di nav çend rojan de Mîr Mihemedê Rewandizê li hespa xwe siwar bû û ji Stenbolê ber bi welêt ve ango Rewandizê ket rê. Hespa xwe dabû çargaviyê lê rê û bajar xilas nedibûn. Çiqas rê diçû, behna axa welêt bi bayê rojhilatî ve li rûyê wî dixist. Bi bêhna axê re, azadî jî li ser ruhê wî geş dibû.

Mîr Mihemed, piştî rewîtiyeke dirêj, xwe gihandibû Trabzona bajarê Behra Reş. Îşev li vir wê bêhna xwe bida û îstirhet bikira. Bi berbangê re, rêwîtiya xwe ya ji ser Sêwasê bidomanda. Serê xwe danî ser balîf û bi xeyala welêt ket xewê. Lê ewrên reş û tarî, xewn û xeyalên Mîr Mihemedê Rewandizê bûn. Ji xewa xwe şiyar bû, aveke sar vexwar lê dîsa jî bêhna wî fireh nebû. Dest avêt berîka xwe qutiya titûnê derxist, cixareyekê pêçand. Çend hilm li cixareyê xistin û çû ber pacê. Wexta ku ji pacê pêşiya li derî nihêrî, çi bibîne; hespa wî bi serêjêkirî li erdê ye. Hema bi lezûbez derket derve, çû ber serê hespa xwe. Hinek sekinî û fikirî. Gelo ev peyama kî û çi bû? Hê difikirî, şeş-heft zilamên bidestxençer, Mîr Mihemed dorpêç kirin. Rast e, ev kemînek bû. Mîr jî bê çek û tifing bû. Di vê kêliyê de gotinên Baba Tahirê Hemedanî hatin bîra wî;

"Her ku ev aşiq e ji can natirse.
Aşiq, ji zincîr û zindan natirse
Dilê aşiq weke gurê birçî ye
Ku ew ji heyheya şivan natirse."

Encama vê kemînê diyar bû lê rev, gazinc, xwestina bexşînê û hwd. ji Mîr Mihemed re, ji serpêhatiyên wî re, ji lehengiya wî re û ji armanca wî ya azadiyê re nedibûn. Bi kûrahiya dengê Evdalê Zeynikê ve dest da xwe û bê xof û tirs, bi zilamên bidestxençer re dest bi şer kir. Şerê wî yê herî demkurt, şerê wî yê dawiyê bû.




Ev şer, şerê Mîr Mihemed ê cara yekem nebû. Mîr Mihemed, him ji bo rizgariya neteweya xwe him jî ji bo yekitiya neteweya xwe, nêzî bîst salan şer kiribû. Mîr Mihemedê Rewandizê, piştî têkçûna serhildana Babanan, ji bo çareserkirina nakokiyên malbatî û herêmî, eşîra Babanan digire bin hîmaya xwe. Ji aliyê din ve jî, ji bo hevparî û yekitiyê pêk bîne û ji serdestî û bandora Osmaniyan - Îraniyan rizgar bibe, bi eşîrên din re jî dikeve nav danûstandinê. Eşîrên ku ji rizgariya gelê xwe wêdetir, ji ber aborî û desthilatdariya xwe ji Osmanî û Îraniyan qut nabin re li hev nayê û bi wan eşîran re şer dike. Mîr Mihemed, waliyên ku bi destê desthilatdaran hatiye tayînkirin jî nas nake û bi hêzên xwe êrîşê dibe ser wan. Li gelek bajar û bajarokên herêmê, ji rêveberiya serdestan xilas dike û hêzên Osmanî û Îraniyan gelek cihan têk dibe. Di sala 1830'î de bajarokê Xoşnav û Sûrçiyê digire û serxwebûnê îlan dike.

Mîr Mihemedê Rewandizê, li her derê, bi zanistiya xwe, ilm û îrfana xwe, bi zîrekî û wêrekiya xwe, bi oldariya xwe nirx û rêzdariyeke mezin dibîne, digire û wek "Mîrê Mezin" tê binavkirin. Bi feraseta siyaseta xwe û bi rêveberiyeke bipîvan û biexlaqê ve jî, bandoreke mezin li ser civakê çedike. Di demek kurt de Erbîl, Herîr, Koye, Raniyê jî rizgar dike û bi siyaseteke baş wan bajar û bajarokan bi rê ve dibe. Sînorê serxwebûnê hetanî robarê Zapa jêrîn berfireh dike. Li ber hêza Mîr Mihemed, walîtiya Bexdayê neçar dimîne û hikûmeta Mîr Mihemedê Rewandizê qebûl dike. Piştre Zaxo, Dihok û çend bajarên din jî dikevin destê Mîr.

Li ser wan geşedanan, hikûmeta Osmaniyan, mezinbûna serxwebûna kurdan ji bo xwe xetere dibîne û fermaneke taybet dişîne ji waliyê Sêwasê Reşît paşê re. Reşît Paşa jî demildest artêşeke mezin kom dike û ber bi Rewandizê ve diçe. Mîr Mihemed pê hesyaye û hemû tevdîr û ewlehiyê girtiye, li ser gêdûka Elî Begê li benda artêşa Osmaniyan e. Lê artêşa Osmaniyan jî vala nebû, li newala Herîriyê bi artêşa Bexdayê re li hev hatibû û yekitiya xwe çêkiribûn. Li gelek bajarokên Kurdistanê jî zilam û mîlîsên xwe kiribûn nav tevgerê. Oldar, alim û meleyên kurd ên girêdayî Osmaniyan jî li mizgeftên herêmê bi xutbeyan piştgirî didan artêşa Osmaniyan û digotin; "Şerkirina li hemberî artêşa xîlafetê/Osmaniyan sûc û guneh e."

Li ser evqas geşedanên neyînî, Mîr Mihemed lez nekir û gelek fikirî. Ger wiha bibe, ji ber pirsgirêkên navxweyî, yan wê li gelek cihan komkujiyên mezin pêk bihatana yan jî ji bo silametiya gelê xwe ew ê bi Osmaniyan re li hev bihata. Reşît Paşayê Osmanî ji bo lihevhatinê peymanekê danî holê û Mîr Mihemed jî ji bo pêşîgirtina îxanet û komkujiyeke mezin ev pejirand û artêşa xwe rawestand. Li gor vê peymanê, serxwebûn û hikûmeta ku Mîr îlan kiriye hat betalkirin û belavkirin. Ji bo demeke kurt Mîr Mihemed, tenê bi statuya mîrtiya eşîra xwe çû Stenbolê, ji welêt hat dûrxistin. Walîtiya gelek bajar û bajarokan carek din bi hikûmeta Osmanî û Îraniyan ve hat girêdan. Carek din jî ber sedemên navxweyî gelê tevahiya welêt, ji bindestiyê rizgar nebû. Her çiqas Mîr Mihemed, ji welêt dûr mabe jî, vala nasekinî. Tim û tim bi nas, dost û hevalên xwe yên ku bawerî bi wan aniye re di nav têkiliyê de ye. Bi dawiya qedexeya çûyîna welêt ve, ew ê bi lezûbez çûbûna welêt û di demek kurt de pirsgirêkên navxweyî çareser bikira û serhildan û armanca xwe ya nîvcomayî ya azadiya welêt, bibira serî. Lê niha, tenê dikarîbû têkiliyên xwe xurt bikira.

Piştî demeke dirêj, bi vekirina rêya welêt, ji Stenbolê ber bi welêt ve rêwîtiya Mîr Mihemedê Rewandizê dest pê dike. Êdî kelecan jî dest pê kiribû. Lê belê dijminê wî yê herî mezin waliyê Bexdayê Elî Riza Paşa, li ser xetere û qeyrana Mîr Mihemed, peyamek dişîne ji hikûmetê re. Hikûmeta Osmaniyan jî demildest fermana qetla Mîr Mihemed derdixe û dişîne walîtiya Sêwasê. Peymana ku bi xwe çêkirine binpê dikin û bi hêzeke taybet a girêdayî walîtiya Sêwasê li Behra Reş Mîr Mihemedê dixin kemînê, bi birîndarî desteser dikin û nêzî berbangê wî bi dar ve dikin.

Berfa zivistanê dibe kefenê Mîr Mihemedê Rewandizê. Rûpela salnameyê sala 1838'an nîşe dide.

# Lihevkirin dê bandorê li herêmê bike

Navenda Nûçeyan

Piştî ku fermandarê giştî yê Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) Mezlûm Ebdî di çileyê de însiyatîfa yekitiya neteweyî ya kurdî ragihand, partiyên kurd ên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dest bi rêzehevdîtin û danûstandinan kir. Di encamê de Partiyên Yekitiya Niştîmanî ya Kurdî (PYNK) û Encûmena Niştîmanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) wek gava destpêkê lihevkirin û ev di 17'ê hezîranê de ji raya giştî ya cîhanê re hat ragihandin.

Qonaxa yekemîn bi hevdîtinan di navbera Partiya Yekitiya Demkokratîk (PYD) û ENKS'ê de dest pê kir. Piştre di qonaxa duyemîn de ew hevdîtin veguherîn danûstandinên yekser di navbera PYNK`ê (ji 25 partiyan pêk tê) û ENKS'ê de. Herdu aliyên kurdî li ser nêrîneke siyasî ya hevpar li hev kirin û xalên Peymana Duhokê ya 2014'an (Rêveberî, Hevkarî, Ewlekarî û Parastin) weke bingeha hevdîtinên navbera herdu aliyan hatine qebûlkirin. Di demeke kurt de wê peymaneke giştî ya nû bê îmzekirin.



Pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê lihevkirina pêşîn a aliyên kurd wekî xaleke girîng nirxandin û diyar kirin ku dê yekitî bandorê li pêkhateyên din ên herêmê jî bike, her wiha dê pirsgirêkên heyî jî çareser bike

**'Yekitî dê bi bandor be'**

Girêdayî girîngiya vê lihevkirinê sekreterê Partiya Çep a Kurd ê Sûriyeyê Mihemed Mûsa diyar kir ku ev lihevkirina girîng wê hêviyên Gelê Kurd bi cih bîne û got: "Her wiha dê bi awayekî erênî bandorê li kurdan bike. Dê bandorê li pêkhateyên din ên herêmê jî bike. Yekitî dê zemînek bingehîn û xurt ne tenê ji bo gelê kurd, di heman demê de ji pêkhateyên din re ji ereb û suryan ên di Rêveberiya Xweser de ava bike. Ez bang li aliyên din dikim ku bi hev re li hemberî xeteriyan bisekinin."

Mihemed Mûsa behsa daxuyaniya wezîrê dervê yê Tirkiyeyê kir û mijar wiha şîrove kir: "Di rewşên herî dijwar de ku em tê re derbas bûn em bi hev re bûn û em ê bi hev re ne. Lihevkirina çêbûye girêdayî kurdan e. Diviyabû ev lihevkirin ji zû ve pêk bihata. Lê niha pêk hat. Em bi tevahiya pêkhateyên din re yek in û em ê wisa bin ku rêya siyasî û projeyên xwe berdewam bikin."

**'Lihevkirin gavek erênî ye'**

Hevserokê Partiya Yekitiya Suryan a Sûriyeyê Senherîb Bersûm jî da zanîn ku lihevkirina pêk hat û ev tişt erênî ye û wiha axivî: "Zemînekê ji bo diyalog û lihevkirinên pêşerojê ava dike ku encamên wê li ser Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê erênî ne. Tevî wê jî dê bi awayekî erênî li ser sazumaniya siyasî ya Rêveberiya Xweser bandorê bike. Ji wê zêdetir ew ji bo vedîtina çareseriyek siyasî ji aloziya Sûriyeyê re erênî ye. Aloziya ku girêdayî gelek mijaran e, di nav de diyaloga di navbera gelê Sûriyeyê bi xwe de yê ku tune bû, bingeha çareseriya siyasî ya Sûriyeyê ye."

Bersûm di axaftina xwe de bal kişand ser daxuyaniyên wezîrê derve yê Tirkiyê û wiha axivî: "Reşkirina lihevkirinê, armanc dike parçebûnê li herêmê pêk bîne û fîtneyan di navbera pêkhateyên wê de belav bike. Bi taybetî ji ber ku herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hinekî aram e. Her wiha ev bertekên neyînî, sînordarkirina mîna van lihevkirinan armanc dike. Em piştgiriya her cureyek mîna van lihevkirinan dikin û hêvî dikin ku lihevkirinên mezintir di pêşerojê de hebin."

**'Em ê hev biparêzin'**

Endamê Desteya Rêveber a Partiya Nûjen û Demokratîk a Sûriyeyê Îbrahîm El-Selac lihevkirina partiyên kurd erênî nirxand û bi jêdera hêviya pêkhateyên din ji bo ku bibin yek, wesifand û wiha bi lêv kir: "Welatê me di pêvajoyeke dîrokî re derbas dibe. Gef li gelê me tên xwarin, ji bilî yekitiyê em ji vê xeteriyan xilas nabin. Dê yekitî û lihevkirinê bi xwe re ewlehî û aramiyê pêk bîne. Divê tevahiya pêkhateyên herêmê hewl bidin ewlehî li herêmê pêk were. Her wiha divê ereb jî bibin yek da ku tevahiya hesasiyetên di navbera xwe de rabin. Divê hişmendiya girêdana bi aliyan ve rabe. Em ê taybetmendiyên hevdu biparêzin."

# 'Tundiya li hemberî jinê polîtîk e'

Li gorî daneyên ajansa Jin Newsê meha adarê 34, nîsanê 34, gulanê 31 jin ji hêla mêran ve hatin kuştin. Navenda Lêkolîna Qada Polîtîk a Civakî li 28 bajaran bi hezar û 873 jinan re anketek çêkiribû û li gorî anketê ji sedî 27 jin di pêvajoya vîrusa koronayê (Covid-19) de bi şîdetê re rûbirû mane. Ango ji 100 jinan 43 jin bi şîdetê re rûbirû mane. Her wiha piştî ku hikûmet vîrus kir hincet û bi lezûbez Qanûna Înfazê derxist û êrîşkar serbest berdan. Bi serbestberdanê re êrîşa li hemberî jinê zêdetir bû.

Bi tayînkirina qeyûman re gelek sazî û dezgehên girêdayî şaredariyên Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) hatin girtin. Li herêmê ligel ev qas astengî û zextan Komeleya Jinan a Rosayê hat vekirin. Ji bo tevahiya herêmê xebateke girîng da meşandin û bibû navnîşana yekem a jinê. Lê demek berê bi ser komeleyê de girtin û dest danîn ser belgeyên komeleyê û endam û rêveberên komeleyê hatin girtin.

Endama Avakar a Komeleya Jinan a Rosa Ayla Akat Ata, der barê şîdeta li hemberî jinê û komeleyan de nêrînêm xwe anîn ziman. Ata, destnîşan kir ku şîdeta li hemberî jinê polîtîk e û wiha got: "Em li gorî daneyan her tim nirxandinên xwe dikin. Kuştin, mirin û her cureyên şîdetê ji hêla desthilatdaran ve pêk tê. Raya giştî niha ji kuştin û şîdeta li hemberî jinê re çavên xwe girtiye. Jinên ku li kolanan dawazên xwe tînin ziman jî bi şîdetê re rûbirû dimînin. Ev tişt bi her awayî nayê dîtin. Ev tişt tê wateya şîdeta li hemberî jinê polîtîk e."

Akad Ata da zanîn ku di serdema heyî de ji bilî Tirkiye û Kurdistanê di asta global de jî Tevgera Jinan a Cîhanê vê rewşê dinirxîne û nîqaş dike. Ata destnîşan kir ku Tevgera Jinan a Tirkiyeyê û Tevgera Jinan a Kurdistanê jî bi salan e bûne hêza herî dînamîk û aktîf a vê pêvajoyê û wiha pê de çû: "Em dikarin bêjin ku di van 20 salên dawî de li ser vê erdnîgariyê yek ji têkoşîna hat meşandin jî têkoşîna azadiya jinê ye û destketiyên wê yên mezin jî hene. Li ser esasê van destkeftiyan, li Amedê jin dibêjin, 'Hevserokatî xeta me ya xemrî ye'."

Ata, da zanîn ku ji bo jin destkeftiyeke din bi dest nexin, gaveke din neavêjin, polîtîkayeke şîdetê û zexteke zêde tê meşandin û mijar wiha şîrove kir: "Di serdema heyî de pêvajoya têkoşîneke 20 salan a ji têkoşîna 300 salên borî xwe xwedî dike heye. Em weke Tevgera Jinên Kurd, Tevgera Jinan a Cîhanê weke mîrasekê qebûl dikin û em di roja me de li vê erdnîgariyê vê mîrasê mezin dikin. Em vê hem jî li erdnîgariya Mezopotamyayê ya jin herî zêde lê hatiye pelçiqandin, tune hatiye hesibandin, li cihê weke çîna yekem hatiye pelçiqandin em rêxistina pêşî û destketiyên pêşîn ên jinan derdixin holê. Li hember jinê bêtehemûliyek heye. Her wiha bi binçavkirin û girtinan hewl didin me asteng bikin lê li pişt van jî polîtîkayên stratejîk hene." *AMED*



# Li Başûr bêkarî zêde bû

Li başûrê Kurdistanê piştî belavbûna vîrusa koronayê rêjeya bêkariyê ji sedî 20'î gihîşt ji sedî 44'an. Nêzî 200 hezar karker jî ji kar hatine derxistin.

Rêxistina Aştî û Azadî yek ji rêxistinên civaka sivîl e. Rêxistin li ser asta bêkariyê raporek amade kir. Di raporê de hat destnîşankirin ku ji 14'ê adara 2020'an heya 1'ê hezîrana 2020'an, li seranserê herêmê rêjeya bêkariyê zêde bûye.

Rêveberê rêxistinê Ebdulsemîh Mihemed bal kişand ser raporê û diyar kir ku beriya koronayê rêjeya bêkariyê ji sedî 20 bû lê piştî belavbûna koronayê ev rêje ji sedî 22 zêde bû. Mihemed, da zanîn ku ji sedî 73 welatî niha pirsgirêka aboriyê dijîn.

Ebdulsemîh Mihemed, destnîşan kir ku niha tenê li Hewlêrê 45 hezar ajokar bêkar mane û wiha got: "Di dema qedexeya derketinê de, gelek kargeh karên xwe rawestandin. Ji ber vê yekê jî nêzî 200 hezar karker, bê kar man. Tenê li kargehên çîmento, nêzî 4 hezar karker bêkar man. Ji xwe bi giştî karkerên kargehên çîmentoyê 5 hezar in. Em dikarin bêjin li Herêma Kurdistanê ji destpêka belavbûna vîrusê û qedexeya hatin û çûnê de qeyrana aboriyê heye."

Her wiha li gorî qanûna hejmara 71'î ya sala 1987'an, mafê karkeran diyar e û di her şertî de divê mûçeyên karkeran were dayîn û neyê birîn. Rêveberê Rêxistina Aştî û Azadî Mihemed mijar wiha nirxand: "Gelek kargeh karkeran ji kar jî derxistin û ev tişt jî bû sedema binpêkirina mafên karkeran."

Li gorî rêjeya sendîkaya karkerên Herêma Kurdistanê, zêdetirî 200 hezar karker û karmendên beşên taybet, bê kar mane. Her wiha zêdetirî 30 hezar karkerên nav bazarê jî ji karê xwe dûrketine. *HEWLÊR*

# Hoy Mamo!

Încîl Selçûk

Mamo, nizanim ji ku dest pê bikim, çi bêjim û çi nebêjim.

Min dixwest behsa tiştên xweş ji te re bikim. Lê dizanim; tu ne ji wan kesên î ku guhên xwe li tiştên xweş vedikin û xwe li yên nexweş jî piştguh dikin. Lewma ez ê hema ji berekî ve hin tiştan bibêjim.

Van rojan 100 saliya temenê te ne. Heke wê êvara bêyom, li wê kuçeya kambax, wan destên tarî, ew guleyên bêbext li bedena te ya westiyayî nehatibûna reşandin, belkî me yê 100 saliya rewşenbîriya te bi hev re pîroz kiriba. Xwedê zane ka ew ê çiqasî ji bo me baş bûya. Serkehniya pênûsa te ew ê ruhê me yê be jî, hişk hola av bida û em pê geş bûbana.

Dijminên ronahî û dostên tarîtiyê bi qeleşî xwestin coka ava vejînê li ser zeviyên me qut bikin û xwestin çiraya me vemirînin. Lewma êrîşî te kirin, tu ji me veqetandin.

Ew êrîşkar pir nezan û çav kor bûn. Zen dikirin ku bi guleyan mirov têne kuştin. Ji korefehmiya xwe fêhm nekiribûn ku çira bi guleyan venamirin, her û her hil in. Ew qasî ehmeq û bê hiş bûn ku sax û miriyan ji hev venaqetînin. Ji ber ku yên şehîd heta hetayê sax, yên qatil di cî de dimirin.

Agahiyek biçûk ji roja 100 saliya te jî bidim te; gelek kesayet û şexsiyetan rojbûna te bi vîdeoyeke dirêj, bi gotina "Rojbûna Te Pîroz Be Apê Musa" pîroz kirin. Di rûpelek Youtubê de weşandin.

Dizanim; ger ji te pirsîbana, te yê bigota; 100 lib şekirê belek bikirin, bi navê min bidin destê 100 zarokên Kurdistanê wan pê şa bikin. An jî li Kurdistanê 100 şitlên daran biçînin.

Lê ma vî zemanê kê bi ya kê dike. Ev Youtube û medya civakî jî hasil bûne, êdî rewşenbîrên me gelek jê, ji Kurdistana serbixwe bêhtir xema şopdarên Youtuba xwe dikşînin...

Êdî çi bêjim; li kolanên bajarên me, hîn jî xwîn dirije. Çiya û newal, têne bombebaran kirin. Hîn jî, di loxeta zaliman de "navê kuştina kurdan paqijahî ye." Genim û "Qimil" bi hev re tê şewitandin.

Êdî ne tenê fîkandina kurdî, guhdarkirina wê jî dibe sedema êrîşên hovan. Ciwanê kurdan bi sedema guhdarîkirina stranên kurdî, ji dil ve têne kêr kirin.


Nivîskar û rewşenbîrên me piraniya wan bi zimanê dagirkeran dinivîsin. Xwe bi nivîsa tirkî entelektuel dihesibînin. Te bidîta dema tirkî dibe şilde bilda devê wan, te yê hema çav û guhê xwe bigirtana. Ya qenc ez behsa wan nekim. Bi xwedê bibihîzin min tiştin ji te re gotine. Ew ê qiyametê rakin, ji ber canik û camêran ji xwe pir razî ne...

Destê min ji te nabe, lê divê xatir ji te bixwazim. Heta hevdîtinek din. Bi hêviya ku di 101 saliya te de, navê te li 101 dibistanên azad bête danîn, bi xatrê te Mamo.



# Li pey şopa hin şahidan

Rojda Yaşîk



Rojeke sar û ronkayî, em du jinên kurd di bin darcêwiyan de dimeşin; bêhneke seyr, baxçeyekî bi hezar tonên kesk û zer ve xemilî, sohbeteke şên û kûr...

Hevala min kurdeke başûrê Kurdistanê ye lê wekî bi milyonan kurdan, li bajarekî Ewropayê hatiye dinê û mezin bûye. Wê edebiyat xwendiye, metnên ezamet ên şaristaniya rojavayî xitim kirine û berê xwe daye rexneyeke dij-mêtinkar. Li pey rêçên koletî û bindestiya kurdan di edebiyata Afro-Amerîkanan de ye. Bi kelecen qala romanên Toni Morrisonê dike, paşê ji nişka ve dipirse; ma gelo Yaşar Kemal jî nabe ku derd û kulên gundiyên Kurdistanê, palêyên feqîr, xulamên bêhêvî vegotibe.

Ez xwe kerr dikim, disekinim. Ew gotina xwe wiha didomîne; ez bi zimanê tirkî nizanim lewma min bes romaneke wî bi zimanê siwêdî xwendiye. Min pir xwest hevpeyvîn, nivîsar, vîdeo hema derheqê wî de çi hebin bizanibim, bixwînim. Lê mixabin, ez bi tirkî nizanim…

Îcar ew xwe kerr dike û ez dibêjim; tê bîra te gelo, Morrisonê di nivîsareke xwe de digot, divê nivîskar baş pê bizanibe ew ê/a kinyê û çawa li hemberî neheqî, zilm û zordariyê biaxife lê jixwe hemû nivîskar her tim diaxifin/dinivîsin. A girîngtir ew e ku nivîskar gelo li hemberî çi xwe kerr kiriye? Ji ber ku ziman ne bi tenê alafa vegotinê ye belkî zêdetir alafa veşartin, binecilkirinê ye.

Wê bi ken û fen serê xwe ba kir û got; tu dizanî ev karekî çetin û berfireh e. Xwezila rojekê me bikaribûya bi xwendineke sîstematîk berhemên wan nivîskarên êş û kesera miletê me bi çavên serê xwe dîtine, analîz bikirana.

Di wê roja sar de, em her du li kafeyeke li kêleka parkê rûniştin. Wê pirtûkek vekir û derbasî 'alemeke din' bû. Min jî encama axaftinên me nivîsî.

**Helwesta nivîskarên tirkiyeyî**

Dewletên burjuva ji hemwelatiyên xwe bi tenê tiştekî dixwazin; li hemberî 'esasên dewletê, zagonên dewletê, berjewendiyên dewletî rêz bigireyan jî bi awayekî aşkera dijberiya wan neke. Lê belê tu daxwazeke van dewletan nîn e ku hemwelatî ji serokên dewletê hez bikin an jî stûyê xwe li ber partiya desthilatdar xwar bikin. Di serdema împaratoriyan de an jî di desthilatiyên faşîst de hemû hemwelatî neçarbûn ku fermanberiya serokan bikin lê belê êdî tu mecbûriyeteke bi vî rengî tune ye.

Di dîroka dewleta tirkan de, hikûmet kî dibe bila bibe, ev mecbûriyet her hebûna xwe diparêze. Ji çanda koçeriyê ya tirkan heya împaratoriyê û avabûna komara Tirkiyeyê vê yekê berdevam kiriye. Madem ku mijara me edebiyat bû, ka werin em bi çend nimûneyan rave bikin; gelo helwesta nivîskar û şaîrên navdar; Nazim Hikmet, Sabahattin Alî, Yaşar Kemal, Azîz Nesîn, Zulfu Lîvanelî çi bû?

Gava meriv bi awayekî serroberro lê dinêre yekser aşkera dibe ku van hemû kesan tu carê dijberiya komara tirkan nekirine û heya hebûna komarê wekî "xêra xwedê" dîtine. Lê belê, mirovên kêm zêde bi dîrok û hêmayên bingehîn ên komara tirkan dizane, her wiha dizane ku her çiqasî navê rejîmê komar be jî, taybetmendiyên vê komarê yekparêz, faşîst û mîlîtarîst in. Gelo van nivîskaran li hemberî van taybetmendiyan çi helwest nîşan daye?

Nimûneyê sereke Nazim Hîkmet e; wî her çiqas ji bo Quwayî Mîllîyeyê helbestên mîlîtarîst, ji bo avaker û serokê komara tirkan Ataturk, helbest nivîsîbin jî, bi awayekî ecêw ew bi "komûnîstiyê", "xayintiyê" hat binavkirin û ji destê dewletê gelek zilm û zordarî dîtin.

Belê, Nazim Hîkmet bi sedan helbest, name û nivîs li pey xwe hiştine. Lew mirov bi hesayî dikare naveroka nivîsên wî şîrove bike û li gorî perspektîfa xwe encaman jê derxîne. Lê gelo wî li hemberî çi xwe kerr kiriye? Heya dibe ku xwekerrkirin gotineke pasîf be, wî gelo çawa rasterast piştgirî daye qetlîama ermen, pontus û kurdan? Wekî tê zanîn Quwayî Mîlliyeyê şerê eslî li hemberî ermen, pontus û kurdan kir. Nazim Hikmet piştgirî da Quwayî Mîlliyeyê û paşê jî bû cerdevanekî dilsoz ji bo komara tirkan. Lê belê ew dîsa jî wekî "tirkê maqûl" nehatiye qebûlkirin. Her wiha ji wî hatiye xwestin ku bi awayekî aşkera bîadî Ataturk bike. Lewma jî ji bo Ataturk "qesîde/kaside" (yanê di eslê xwe de daxwaznameke efûyê) nivîsiye. Ka werin em niha beşeke ji wê bixwînin;

"Min biborîne. Belê min serê te bi xwe êşand, lê muhrek li eniya min xistine û dibêjin "Nazim leşkerên înkilabê teşwîk dike ku ew îsyan bikin" ez pê bawer im ku ji xeynî alîkariya cenabê te, ez ê nikaribim vê qîrê ji eniya xwe re bikim. Tu tekane serokê înkilabê yî ku ez serî lê bidim. Ez edaletê ji cenabê te û kemalîzmê dixwazim. Li ser înkilaba tirkan û cenabê te sond û peyman dikim ku ez bêsuc im."

(Nazım Hikmet, Cumhur Reisi Atatürk'ün Yüksek Katına, 18 Ağustos 1938)

Nimûneyeke din Sabahattîn Alî ye. Sabahattîn di sêrî de turanparêz e. Ziya Gokalp wekî îdolê xwe qebûl dike. Her wiha tê zanîn ku ew mudawîmekî "Ocaxên Tirkan" e. Lê paşê fikrên wî hinekî diguherin, dijberiya tekpartîtiyê dike û derheqê vê mijarê de dinivîse. Lê belê ew her tim alîgiriya fikra "Tirkiyeya xweser" dike. Û cardin ev yek têr nake ku Sabahattîn Alî wekî "tirkê maqûl" bê qebûlkirin. Ji ber ku alîgiriya dewletê têr nake, hemwelat divê rasterast alîgiriya serokê hikûmetê jî bikin. Ji wî tê xwestin ku ji bo Ataturk tiştekî binivîse û ew jî qesîdeyekê dinivîse. Navê qesîdeya wî "Evîniya Min/ Benim Aşkim" e. Ew vê di helbestê de ji Ataturk re wiha dibêje;

" Tu yî / Na dilê min nîn e / Tu yî sînga di min de lê dixî / Tu yî bi navê "bîrdozîyê" di seriyê min de çîk disekinî. Tu yî rojên min ên nîv-sedsalî dadigirî; heke ez te jê derxim, jiyana min beriya ku destpê bike, diqede. Ka risteyeke çawa vebêje vê yekê. Hest piştxûz dibin gava tên nivîsîn. Bi kurtasî ez ê bibêm; min dilê xwe daye Gaziyê Gewre, êdî di sînga min de evîniya wî dijî."

(Sabahattin Ali, Benim Aşkım: 15 Ocak 1934, Varlık Dergisi)

Piştî ku ev qesîde çap dibe û tê xwendin, dewlet cardin derî û derfetên xwe ji bo Sabahattîn Alî vedike.

Nimûneyekî din Azîz Nesîn e. Nesîn di tevahiya jiyana xwe de piştgiriya îdeolojîya fermî kiriye. Ew her tim dewletparêz bûye. Gava behsa salên xwe yên efseriyê dike; dibêje min tu carî telefona dewletê ji bo sedemên şexsî bi kar neanî, ji ber ku divê kes sermiyana dewletê ji bo şexsên xwe bi kar zehî nekin. Belê evqasî jî îdealîst e.

*(https://www.youtube.com/watch?v=BRsovhSBygM)*

Wî tu carî dijberiya dewletê nekiriye lê gelek caran rexne li hikûmetê kirine. Lê cardin dewletperestiyê têr nekiriye û serê wî her bi hikûmetê ketiye belayên cur bi cur.

Nimûneyekî din Yaşar Kemal e. Yaşar Kemal berhevkarekî serketî ye; çi mîrateya çandî û folklorî ya ermen, suryan û kurdan hebe, wî bi awayekî serketî berhev kirine û di bin sîwana nasnameya "Anatolya"yê de pêşkêş kirine. Jixwe tê zanîn ku heya beriya avakirina komara tirkan, Anatolya navê erdnîgariyeke pir biçûk e. Lê paşê "zanist" û akademîsyenên îdeolojiya fermî bi zanetî hemû hêmayên aîdî van miletên qedîm bi "çanda Anatolyayê" bi nav dikin. Bi vî awayî çand, muzîk, folklor, govend; ji nav û nasnameyên xwe yên rastîn dûr dikevin û êdî dibin malê komara tirkan. Yaşar Kemal bi vî awayî nav û nasnameya van hêmayên çandî guhertin û ew li ser navê "tirkbûnê" qeyd kirin. Her wiha di tevahiya emrê xwe de alîgiriya paradigmaya avabûnê ya dewleta tirkan kir. Car carna dijberiya hikûmetan kir lê ew her tim dewletperest û kemalîstekî dilsoz bû.

Mehmet Alî Birand dema ku bi Yaşar Kemal re hevpeyvînê dike, Yaşar Kemal bi şanazî wiha dibêje;

"Dilê min tu carî razî nebû ku welatê min (behsa serdema 12'ê îlonê û salên 90'î dike) li welatên ewropî wekî welatekî îşkenceker bê naskirin. Min nexwest ku ez rûmeta vî welatî bişkênim, lewma ez neçûm Ewropayê û li wir nebûm niştecih. Min tu carî dawetên Yekitiya Ewropayê, Kongreya Amrîkayê qebûl nekirin, ez neçûm." (Mehmet Ali Birand Yaşar Kemal Roportaji, 32. Gun,1997, *https://www.youtube.com/watch?v=3YLCG0VJXIM* )

Belê di salên 90'î û 12'ê îlonê de bi dehhezaran kurd di bin îşkencê de bûn. Jin derdiketin sûkan û di bin bomberbarana artêşa NATO'yê de diqîriyan, bi hezaran gundên kurdan dihatin şewitandin. Gelek ciwanên kurd bes ji bo ku dengê xwe bigihînin dinyayê, agir berdidan cendekên xwe lê belê Yaşar Kemal ketibû pey derdê rûmeta dewleta tirkan!

Nimûneyê dawîn Zulfu Lîvanelî ye. Lîvanelî wekî "çepgir" tê nasîn û heya cemaeta "Ulkucu/Bîrdozên Tirkan" wî wekî "komûnîst" bi nav dikin. Tê darizandin û diçe sirgûniyê. Lê Lîvanelî bi tu awayî dijberiya dewlet, komar û kemalîzmê nekiriye. Bereqsî vê yekê wî her tim alîgiriya komarê û rêgezên komarê kiriye. Lîvanelî jî wekî nimûneyên din, car carna dijberiya hindek rêvebirên dewletê û hikûmetan kiriye. Wî her tim hewl daye ku Mustafa Kemal ji bin barê qetlîamên wê serdemê derxe û îzbat bike ku Mustafa Kemal pîr û pak e.

Bo nimûne wî di 25'ê mijdara 2011'an de di rojnameya Cumhuriyetê de wiha dinivisî: Mustafa Kemal, Seyît Riza û hevalên wî darve nekirine. Ew qaşo "kemalîstên" tirsiyan û gotin ku Ataturk bi rehm e, ew ê efû bike, lewma bi lezûbez ew mirovan darve kirin, kî nin? Heman kesan digot ku "hezkirina Ataturk îbadet e" lê belê wan ji Ataturk hîç fam nekiriye. Belê ev kes, serokwezîrê wê serdemê Celal Bayar û rêvebirê emniyetê û wezîrê Partiya Adaletê Sabri Çaglayangil bûn." (Cumhuriyet Gazetesi, 25 Kasım 2011)

Di hemû nimûneyên jorîn de cardin rasterast û aşkera derdikeve meydanê ku li gorî rêgezên dewleta tirkan, serok û dewlet tu carî ji hevdu cihê nayên hesibandin. Şexsîyetên dinivîsin, muzîk an jî hunerê dikin yanî bi awayekî dikarin bandiorê li civakê bikin, neçar in ku xwe li ber dewlet û xwediyên dewletê îzbat bikin.

Gelek caran gava meriv jiyannîgariya van nivîskaran dixwîne, meriv wisa dizane ku van kesan dijberî zilm û zordariya serdema xwe kirine û lewma ketine zindanan an jî berê xwe dane sirgûniyê. Lê paşê dema meriv hinekî bi hurgilî li mijarê dinêre, cardin aşkera tê dîtin ku gelek ji van nivîskaran an bi şanazî piştgiriya wan qetlîam, îşkence, zilm û zordariyan kirine yaî bi awayekî aktîf alîgiriya dewleta tirk û hikûmetên wê dewrê kirine. An jî ketine malên xwe, xwe kerr kirine. Dema ku derfet ketine destê wan jî, tu carî behsa îşkence û qetlîamên dewletê nekirine ku rûmeta dewleta xwe biparêzin.

Şehîd û şahid; xwişkên cêwî nin. Şehîd dibîne û dimire. Şahid dibîne lê paşê çi dike?

Wekî hevala min gotibû; xwezila em rojekê berhemên hindek nivîskarên şahid bi awayekî sîstematîk analîz bikin ka gelo li hemberî neheqî, qetlîam, koçberî, fermanên hatine serê me çi gotine?

Min xwest ku ev nivîs bibe destpêkek; lewma min destê xwe neda tu berheman. Bêguman di navbera berhem û gotinên berhemdaran de gelek caran ciyawaziyên mezin hene. Lê ez ê bi tenê bi rêya çend hevpeyvîn, vîdeo û arşîvan hindek nimûneyên giştî bidim. Lewma jî dibe ku xwendevan bibêjin; ma heman nivîskar an jî şaîr di berhemeke xwe de helwesteke din nîşan dab û hwd. Dibe ku rast be… Carna berhem ji berhemdar çêtir helwest nîşan didin, carna berhemdar ji ber tirs, nezanî, dilnexwazî û dibe ku hin sedemên din hin gotinên wisa dikin ku dilê xwendevan nazwaze qebûl bike ku wî/ê berhemdara/ê gewre gotineke bi wî rengî kiriye. Lê heya ku em dev ji pêşqebûlên xwe bernedin, ka em ê çawa bizanibin gelo şahidên êşan me çi kirine?



Carna berhem ji berhemdar çêtir helwest nîşan dide; carna berhemdar ji ber tirs, nezanî, dilnexwazî û dibe ku hin sedemên din, hin gotinên wisa dikin ku dilê xwendevan naxwaze qebûl bike ku wî/ê berhemdarê/a gewre gotineke bi wî rengî kiriye

# Şanika Şayhêê Maran (2)

Mehmet Seyîtalîoglu



Gelê wendox û goşdarî dem o dem nîyo wext vîyert ra usar ame, amnan vîyert ra hêgay bî zerd, cûnî çarnay, were zimistanî berd areyê topik berd areyê. Ardî kerdî xize. Hona kî Cemşît kupike de henî bermeno henî bermeno ke xora vîyerto ra. Xêlî wext hewnan ra şî. Wexto ke bî heşar o wext veng goş ro şî. Dormeyê xo seyr kerd. Qayt kerd ke tenê herre rişîye. Dîwar ra jû dîlpîştike lonê kerde ya ame. Seke dîlpîştike dîye. Qula ke dîlpîştik vejîya, û hetê ey ser ame. Tersanê xora payna dîlpîştike na. Dîlpîştike kîşte. A qulake dîlpiştike ci ra ame a qule ebe destê xo tenêê kerde hîra. Xo a qulêra verda ra şî. Xêlî wext şî. Şî dinya roştî de vejîya. Şî welatê Şayhêê marann de vejîya. Seyr kerd ke her ca baxo bostan o. Werteyê bax û bostanî de text esto. No text sirf zernî ra virazîyayo. Dormê textî de kî hênîyê ra awke bel dana. Hewşa verê hênî bena pir û bena tal. Tênê lewê hewşe de are nîşt ro û dest rîyê xo şutî. Text ro ser kerd. Xo xo de vat ‘Aceba hêqî! No senê cayo?’ Cayê kamî yo? Nîya werteyê bax û baxçî dero! No texto zernên yê kamî yo? Dima kî şî textê zernênî sero nîşt ro. Wexto ke textê zernênî ser o nîşt ro, henî qefelîya bi ke, taye hewn ra şî. Çiqa ke mend , çiqa ke hewn ra şî surr ra vayî amey ci. Surr ra vayî amey ci bi heşarê xo. Çimî kerdî ra. Oxro ke amo mekanê Şayhêê marann de vejîyo. Şayhêê Maran kî amo text xo de ronişîyo. Labêle çi bêveng o. Şayhêê marann vînêno ke qulêdo di ling ameyo ha o textî ser o ronişto. Henî matê ci beno vindeno. Xo xo de vano ‘No qulo di ling kotî ra ameyo? Se ameyo tîya? Çi fetelîno! Nê cayan de? Şayhêê Maranê ke vanê cor ra însan o! Cêr ra maro! Cemşît bi çimanê xo Mar dî, dormê de kî maran lîf eşto pêser. Henî bi ci peyînê. Cemşît tersa. Cemşîtî xo xode vat; No çi tecel o, Çi tecelêde sîya yo! To ez ardo eşto wertê nê mar û milawanan.

**Şayhêê Maran ebe usil selam da Cemşîtî**

-Hey benî adem, ti xêr amey. Meterse! Ma to rê tewa nêkenîme. Ti endî meymanê ma say bena. O texto ke ti ser o ronîştîyî o kî textê min o. Mi re hêqî ra îcar bîyo. Ez bi xo kî paşayê nê mar û milawanan o. Nameyê mi kî ŞayhêêMarano. Hêqî şima benî ademî ver ra ya hewt sey serrî şima ra fîsto dûrî. Ardo naca. Ancîya kî şima dest ranêxelêsiyo. Meterse şima cinsê benî ademî ra ke zarar mero ma rê, ma ra caro qirşê zerarî nêreseno şima. Şayhêê Maran emr da maran Cemşîtî rê sifrêde henên fîtra kê! Cemşîtî qet emrê xo de sifreyo nîyanên nêdîbî. Wexto ke Cemşîtî xo rind kerd mird, Şayhêê maran ci ra pers kerd.

-Êy benî adem! Ti ça amey nê cayan. Ti kam î? Ti çi kî? Çi kes î? Çi gêrenînê cayan de?

Cemşîtî çi ke ameyo ey sere- Şayhêê Maran re jû bi jû qisey kerd. Seke qiseykerdena xo qedîya, Şayhêê Maran ci ra vat;

-Hey wax, hey! Cayê ma qulê di lingî re bî eşkera. A kupa ke ti vanî a kupe kî ambarê hengimênê ma bîye. Endî naye ra tepîya ma rê tîya kî rehetîye çîna.

Cemşîtî vat ke;

-Meterse! Şayhêê mi, ê hevale mi nêtawrenê ke şêrê birindîye cayê kupe vajê, ya kî qalê kupe kerê. Çike merdena mi vejîya, o taw paşayê welatê ma înan erzeno dare. Aye ra kî nêtawrenê ke şêrê cayê qalê kupe kerê. Ya kî na xebere ser o qisey bikerî.

Na vatena Cemşîtî sero tenê zerrêŞayhêê Maran bî rehet. Ancîya kî ci ra vat;

-Benî adem qulêdo dekbaz o. Eke bizanê welatê ma tîya der o, ebe dek û dekbaran eynêcayê ma, ma dest ra gênê. Çend reyî ke ez kewto benî ademî dest, zor di belay mi înan dest ra xo xelesna.

Cemşît çend wextî ke lewê Şayhêê Maran de mend gêra înan vero, ci ra minetî kerde.

-Se beno mi veje dinya roştîye, Şayhê mi!

ŞayhêMaran cira vat;

-Ti fikrê vetişî xo ra omidê xo bibirne! Dinya roştîye ti nêvînenî. A qesîye xo vîr ra bike.

Wextê naye ra raver Belkîya amebî tîya. Belkîya ke vanê lajê Usenê Zeynî bî. Usenê Zeynî kî paşay Horasanî bî.

Usenê Zeynî dinya ser o alimêdo zaf berz bî. Zaf zanayox bî. Rojê paşayê Horasanî Usenê Zeynî kitabo pîl kerd ya wend tey dî ke peyxamberê axir zemanî tede aseno. Vat ke; amayena peyxamberê axir zemanî re hona zaf wext esto. Gere şima nê kitabî berêcayêde rind de wedarî. Kitabo pîl berd zerrê sandiqa sêminêne de û zerrêjû oda de da we. Çeberê oda kî zirze kerd. Kîlitêdo girs na pa. Paşayê Horasanî Usenê Zeynî xora jû lajê xo estbî. Nameyê xo kî Belkîya bî. Belkîya kî zaf wendbî. Zaf zanayox bî. Merdena pîyê xo Usenê Zeynî ra tepîya paşayîna Horasanî girewtbî xo dest. Bî pa-



şayê Xorasanî.

Belkîya roje koşkê pîyê xo de xezna pîyê xoro ke fetelya. Koşkê paşayî ro jû bi jû odayêka bi odayêka saye kerdêne. Ame a odayêka ke kitabo pîl tede dabî we, kîlît panaye bîye a oda verde vindert. Vat;

-Bîyarî na oda akerî.

Meraq kerd.

-Qey çeberê na odike zirze kerdo!

Reyna vat;

-Bîyare çeberê na odike akerî.

Çeberê oda kerd ya Belkîya şî zereyê oda. Seyr kerd ke sandiqêda sêmine ha a ca de. Belkîya na sandiqe de yakerdêne. Kitabo pîl tede dî. Belkîya no kitabo pîl girewt xo dest. Pê şew û roj no kitab wend. Peynîye de raşt qiseya peyxamberê axir zemanî ame. Na xebere sero Belkîya text û tacê xo ca ver da kewt rayan. Kewt rayan ke peyxamberê axir zemanî bivîno. Çiqa ke fetelya, çiqa ke çerexîya cayê de nêdî. Peynîye de ame no mekanê mi de vejîya. Mi ra minet kerd. Xêlî wext ke îta lewê mi de mend reyna minet û rica ey ser o, mi kî seba peyxamberê axir zemanî o azad kerd. LaBelkîya bi xo kî mi rê vad kerd ke şertanê mi qebul kero. Şerte mino jûcayê ma kesî ra nêvajo. Şerte di dînê kî xo ra ke peyxamberê axir zemanî dî! Ma vera kî silam ci kero ‘wa şefaatê xo ma ser bo, şefaatê xo ra ma marum nêkero.’Belkîya honde alîm bî, şî. La dinya roştîye nêdîye. Çito ke ti şêrî dinya roştîye. Muxulqatê ucayî bivînî!

Na xebere ser o teselîya Cemşîtî rind kewte. Ê cayan de lewêŞayhêMaran de xeylê mend. Xeylê ke mend. Axirîya Belkîyayî ci rê bîye qisawete. ŞayhêMaran ra pers kerd;

-Ya Şayhê mi, Belkîya kotîra şî? Se bî ey?

ŞayhêMaran vat ke;

-Belkîya tîya lewê mi de xelî wext mend. Mira minet kerd. Vat ke; -Şayhê mi mi veje dinya roşte. Ez xo re şorî dinya roştîye

Mi vat ke;

-Belkîya ti caro dinya roştîye nêvînwnî. La ti ke zaf wazenî, bê şo fîlan cade merge esta . A merge de hênîyêdo pîl esto. Roja îneyî şo xo wedare. Roja îneyî di beranî enê serê awe de danê pero. Berano jû sîso, jû kî qemer o. Ê beranan ke da pero, ‘vaje Ya Xizir û xo berze beranê sipîyî ser. O beran to vejeno dinya roştî. La henî bike ke xo pêt pêbigê. Wexto ke to xo eşt beranê sipîyî ser berano qer xo keno to ver ra. To hewt tabax beno binê hardî, dinya tarîye.

***(Dewam kenîme..)***

---

## Dewey Ma



Cemil Oguz
cemilo@diyarname.com

### Butçeya maskeyan

Tam nêro zanayîş ke di dîroke de maske kînga hamîya şixulnayiş zi, henî belgeyî verê ma danê Fransa. Fransa de mexarey hamey vînayiş û di enî mexareyan de fîgurê însanan ke dîrokey înan resena 20 hezar serî verî... Riyê însanan de maske bîbî.

Dimara maskey qeybî karanê tewir tewiran hamey şixulnayişî. Qeybi vernî nêweşîyey weba bêro girotişî, qeybî gazê kîmyewî û zehf nêweşîyanê bînan...

Samûrayan maske day verê rî xo, ê ke şine sûîkastan bi maskeyan şine, çeteyan maske şixulnayne û di se serey 20'inan de zî henî rêxistinê azadixwazan zî bi maskeyan çalakî kerdêne.

Û di tiyatroyan de zî maske amûrekê muhîme bî. Xo ra wexto tiyatro yeno vatişî maskeya hewena û maskeya bermena yena ma vîrî.

Ma bêr eyro: Virusêk pîl hame xo ro merdiman qelebna. Virusê korona, bi namey bîn "Covid-19". Dinya heme kerd binê tesîrê xo û heta ene nişte hamî niştişî nizdê 500 hezar merdimî merdibî.

Jo çiyo ke merdiman enî vîrusî ra eşkena heta cayke biparêzno maske wa. Tam zî meselay ma ene wa. Sere de Çin, zehfê welatan de maske kerdî mecbûrî; enka Tirkîya de zî… Kerde mecbûrî la çirê sere de ana nêkerde?

Wexto tiya vîrus veciya biryar hame dayişî ke merdimê xebetênê şorê PTT'yan ra bê pere maske bigirê. PTT'y nêşka bin ra wirzê we. Na wey vat ke serê e-dewlete ra şar maske biwazo û înan rê go maskey bêrê. Ene joy zî nêbî. Dimara biryar hame dayişî ke go merdimê xebetênê ra şifre bêro şirawitişî û bi a şifre go merdimî şorê dermanxaneyan û ew ca ra panc hebî maskeyanê xo bigîrê. Henîyan rê şifre şî, henîyan rê nêşî. Û mesela reyna çareser nêbî. Eno wext de henî cayan maskey bi qîmetê ke vay hamey rotişî, henîyan xo bi xo maskey xo viraştî.

Û serê aşmey hezîrane de va ke Tirkîya de rewşe biya normal. La bi enî normalî ra nêweşî nêqediya, merdimê ke merdî bibê tay zî bi temamî nêqediya û reyna biryar hame girotişî ke maske bibo mecbûrî. Nawey merdiman bi perey xo maske girotênê û dayne verê fek û zincey xo.

Nifûsê Tirkîya dewrê 80 milyonî yo. Reqemî tam nêbê zî, dewrê 21 milyon însanî Tirkîya de xebetênê. Enî 21 milyon însanî her jo rocêke tenî maskey ke bidê verê fek û zincey xo keno 21 milyon hebî. Ger ma vacê hebey maske 1 lira wa, rocane 21 milyon lira qeybî maske perey miyanê piyase de geyrenê. Ene butçeyêka zehf pil a. Enî 21 milyon perey kunê bêrîkey (cêbey) kam î? Çende kompanî (şîrketî) maske sero xebetênê û ê maskeyan virazenê, roşenê?..

Ma joy sûcdar nêkenê, çimê ma ro pereyanê joy zî niyo, teni ma wazenê sistemêke bimocnê ra: Tenî bi maske roc dewrê 20 milyon TL pere piyase de geyrenê. Wexto ma çiyanê binan ê ke eleqey xo vîrus ra estê zî bidê verê eney joy, beno butçeyêka zehf û zehf pîle.

Butçe çi bena wa biba, ê perey kunê bêrîkey kamî wa bikoy la pêdiviya ma bi maske esta. Xêrê xo maske bişixulnê… Bi zanê ke ma eşkenê bi maske heta cayke vernî enî nêweşî bigirê. Xu ra hewce nêkeno ez vacî enî rojan Amed û Cizîr ra bigire heta Silêmanî bajaranê ma de vîrus biyo zehf, merdimê ma mirenê… Xêrê xo maske bişixulnê û baş bawnê xo ra.

# Ber bi dîlistanê ve!

Rizgar û şeş hevalê xwe, çar roj bûn di bin çavan de bûn. Cara ewil bû ku tiştekî wisa dihat serê wî! Çar rojên di hucra tarî de perda çavê wî jî reş kiribû, roja derketin derve ber xwe nedidî. Gelo çi kiribû ku ev zilamên di temenê bavê wî de ewqasî ji wan zivêr bibûn. Ew bê xwarin, bê av û çixare hiştibûn? Mirov dikarîbû bê nan û av bimana lê çixare? Ax ku niha cixareyek ji tûtina xursê pêçayî di nav tilîkên min de bûna!

Di çar rojan de tekana xeyala wî bû ev mîrat... Di pirsan de wî tirtirê ser peritî jê re gotibû 'carekê binêre heke tu bersiva pirsên min bidî, ez ê yekê ji vê çixareya dirêj bidim te.' Xuya bû wan jî bi derûniya Rizgar û hevalê wî dizanîbû. Danûstandinek wilo etarên deşta Mêrdînê jî nekiribûn; çixareyek bi bersivekê! Wekî mirov bêje kîloyek ceh bi bazinkî zêr. Ne tu bazar bû!

Jixwe wan jî li hev nekiribû. Piştî roja çaran ew biribûn, 'hizûra' dozger û demildest ew tewqîf bibûn. Berêvarkî her pênc bi dû hev de xistin wesayîtekê ku ji derve de hundirê wê nexuya bû. Di destê wan de dîsa ew 'pêlîstoka' hesinî lê êdî nema diêşand wekî berê. Li hev nêrîn û di serê her pêncan de heman pirs hebû. Ka yê şeşan? Belê yek ji wan kêm bû. Ligel ku di derheqê Hemedîn de tiştek nizanîbûn jî, dilşadiyek mîna bayê reş dilê wan hênik kiribû. Xwe bi xwe digotin 'hemedîn feqîr bû baş e ku ew berdan.'

Spîker nûçeyên êvarê pêşkêş dikir, ajoker hinekî dengê radyoyê bilind kir 'belê guhdarên ezîz îro jinekê ku dixwest mêrê xwe berde ji aliyê mêrê xwe ve hate kuştin, kujerê ku piştî jina xwe da ber kêran reviya û nebedî bû. Li Stenbolê şeş terorîst hatin girtin, terorîstên ku hatin girtin her tişt yek bi yek ji peywirdarên ewlehiyê re vegotin. Li xwe mikur hatin bê çi kirine û nekirine! Di encamê de pênc ji wan hatin girtin, yek jî ji qanûna poşmaniyê sûd wergirt û hate berdan. Hunermend Aydin Aydin careke din bi xwe de rît.' Lê belê êdî dengê spîker nediçû wan. Hemedîn zêde ew nas nedikirin, di derheqê wan de çi gotibû? Pirs pirs û dîsa pirs lê bersiva hemû meraqa wan bi Hemedîn re bû. Vî beradayê çolê çi gotibû ku ew hatibûn girtin?

Ber bi nedîyariyek zindanî ve diçû wesayît, li dû xwe hiştibûn hemû hezkiriyên xwe. Rizgar li dê û bavê xwe fikirî. Ji zû de bû ku ew nedîbûn. Gelo niha çawa bûn? Demsal bihar bû, wexta bêriyê, pîvok û kerengan bû. Her sal destê wî di nav xwînê jî de bûya diçû gund. Lê belê ev wesayît wî nabe gund. Her diçe dûr dikeve ji bihara emrê xwe.

*Necar Baysal*




# Kera wî bi qîmet bû



Hecî ji gundê Eyîndarê ye ku girêdayê Hezroyê ye. Kerê Hecî, kerekî bêkêr bû. Hecî kerê xwe tîne Amedê ku bifiroşe û ji xwe re kerekî baş bikire. Hecî kerê xwe tîne mezatê, dide delal ku jê re bifiroşe û jê re kerekî baş bikire.

Delalê ku li sûkê bazara sewalan dike ji Hecî re dibêje: Sibehê were ez ê ji te re kerekî baş bikirim.

Delal kerî dibe jê re kurtanekî çêdike û pirça pişta stûyê kerî diqusîne û eniya kerî bi boyaxê rengîn dike. Sibetirê kerî tîne mezatê. Hecî jî tê.

Delal bang dike Hecî dibêje: Kanê were ez ê kerê te bifiroşim û ji te re kerekî baş bikirim.

Hecî: De baş e. Mirovek jî hatiye ku ji xwe re kerekî bikire.

Delal jê re pesnê kerê dide: Tu çiqas bar lê bikî kare bibe. Tu çiqas bibêjî jîr e ewqas jîr e. Erê ker e lê bi qasî mirovekî jî jîr e û jêhatî ye.


Hecî devê wî vekirî maye û li delal dinihêre û dibêje: Tu bi qedrê navê xwedê kî, niha tu rast dibêjî an na?

Delal: Ji sedî sed rast e.

Hecî: Bi telaq ez kerê xwe nafiroşim. Min nizanibû ku ewqas bihuner e.

*Riza Uyar*

## XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Pêşdaçekek ku wateya derveyî tîştekî dide 3. Maweyeke demê 5. Cihê, cihêwaz 6. Dem 7. Cihê ku mirov piştî serdana wir dibin hecî. 9. Nefes, bêhn 12. Şewq, ne tarî 14. Mirovê ku demeke dirêj avê venexwe 15. Wekhev, her du alî ne kar kirin ne zerar 17. Awayê tewandî yê cînavka 'hûn'ê 18. Sewaleke kedîkirî ku ji şîr û goştê wê tê sûdgirtin, ji bo laşê mirovê lihevhatî jî tê gotin 22. Piştgirî, destek

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Zeman, çax 2. Rih, ruh
3. Ji bo, qene 4. Tûj
5. Cilê şêx an jî meleyan
7. Hêrsbûn 8. Giyan
10. Qada pêş ya şer
11. Paqij, zelal
13. Bajarekî rojhilatê Kurdistanê
14. Pirtûka pîroz a ji H. Mûsa re daketiye
16. Destjêberdan, jêdûrketin
19. Roja em tê de
20. Dînî, ayênî
21. Pirsa der barê kiryar de
23. Cihê ku genim lê tê hêran û dibe ard

**Bersiva hefteya borî**



# Îfade û wate di siyê de ye

Rohat Ararat

*Hinar Daşgina peykersaz bi şêwazeke xweser, ji têlan peykeran çêdike û bi vê hunera xwe îfade û wateyê derdixe holê. Daşgin her wiha diyar dike ku ew hewl dide vê hunerê berbelav bike*

Dîroka peyker û peykersaziyê gelekî kevnar e. Belavbûna peyker û peykersaziyê di bingeha xwe de ji baweriyê tê. Di serdemên cuda yên dîrokê de mirovên ku bi tiştên baweriya xwe dianî, peyekerê wan ji amûrên wekî dar, kevir û heriyê çêdikir. Di serdema ronesansê de wekî wêne di peykersaziyê de jî şoreşek pêk tê. Bi taybetî Michelangelo bi peykerên xwe yên wekî “Dawid” û “Mûsa” deng vedide. Michelangelo bi berhemên xwe yên kûrwate ji bo hunermendên nû perwede bike dibe mamosteyek. Her wiha Augusto Rodîn ku di navbera salên (1840-1917) de dijî, wekî pîrê peykersaziya nûjen tê nasîn. Rodîn, ne tenê bi hunera xwe ya bedew, di heman demê de hest û îfade jî li berhemên xwe bar kirine. “Zilamê Difikire” yek ji berhemên wî yên herî biwate û navdar e.

Hemû tiştên di xwezayê de ji bo hunerê amûr in. Ji keviran bigire heta daran, ji ax û heriyê heta şimayê, ji kaxizê heta hesin û hwd. bi saya hunermendên afirîner dibin berhem. Têl jî yek ji wan amûmaran e ku bi destê û hunermendan veduguhere berhema hunerî. Peykerên bi têlan an jî bi hesinan tên çêkirin, di nav beşa hunera nûjen de cihê xwe digirin. Bi destên hunermendan car caran sewal, car caran mirov û car caran jî berhemên cuda tên afirandin.

Hinar Daşgin yek ji wan kesan e ku bi têlan hunerê diafirîne. Di destpêkê de em hinekî serpêhatiya Hinarê vebêjin piştre derbasî serboriya hunera wê bibin. Hinar Daşgin ji navçeya Sariqamişa Qersê ye. Li Stenbolê mezin dibe. Mamoste ye û ji sala 2011’an ve ye ji ber karê xwe li Amedê dijî. Daşgin ev 9 sal in wêneyan xêz dike. Destpêkê wekî hobî ji xwe re xêz kiriye. Di heman demê de li Amedê çûye qursa wêne ya ji aliyê wênesaz Xefûr Hisên ve dihat dayîn. Di sala 2012’an de jî ligel 9 hevalên xwe yên jin ku hemû jî şagirtên Xefûr Hisên in li Navenda Çand û Hunerê ya Cigerxwîn pêşangehekê vedikin. Pêşangeh ji tabloyên boyaxa zeytî pêk tên.

**Bi berhemên xwe kêfxweş dibe**

Daşgin, piştî ku mamosteyê wan Xefûr derdikeve derveyî welêt, di valahiyekê de dimîne. Bê biryar e, nizane çi bike. Li aliyekî din jî lêgerînên xwe didomîne. Piştî demekê peykersaz Seyvan Saediyan nas dike. Hunermend Saediyan peykerên ji hesin çêdike. Saediyan di sala 2017’an de qursên wêne û peykersaziyê dide destpêkirin. Daşgin jî li gel 7 şagirtên din dest bi qursê dike. Der barê qursên dîtiye de, Daşgin wiha dibêj e; “Me salekê qursa wêneyê pênûsa reş dît. Piştî salekê me dest bi qursa çêkirina peyker kir. Destpêkê fikreke min a çêkirina peyker tunebû. Lê dema min xwe ceriband kêfa min jê re hat û min berdewam kir. Dema ku min berhem afirandin gelekî kêfxweş bûm.”

**Di peyker de wateyên kûr**

Hinar Daşgin, bi vê xebatê qet qîma xwe nayne. Her di nav lêkolîneke xebat û hunereke xweser de ye. Dixwaze şêwazeke wê ya xweser hebe. Li ser wê lêgerîn, lêkolîn û encamê wiha dibêje: “Bala min her li ser hunereke xweser bû. Min dixwest hunereke cuda bi pêş bixim. Di encama lêkolînên xwe de ez rastî peykerên bi têlikan tên çikirin hatim. Ev xebat û huner bala min kişand. Herî zêde tiştê ku di peykerê bi têlan hatine çêkirin de bala min kişand; siya wan bû. Dibe ku tiştekî girîng xuya neke. Lê di peyker de gelek îfade û wateyên kûr hene. Li ser vê yekê min xwe ceriband.”

**Çêkirina peykerê yekemîn**

Daşgin ji me re qala destpêk û çîroka peykerê xwe yê yekemîn dike û van tiştan tîne ziman: “Karakterê min ê destpêkê Adem bû. Him min Adem afirand, him jî Adem min û hunera min afirandin.





Bêguman aliyê xwe yê mîtolojîk jî heye ku bi wê bandorê min ew çêkir û navê Adem lê kir. Mamosteya min jî eciband û ji min re got dewam bike.”

Piştî demeke kurt di sala 2018’an de mamosteya Daşgin diçe Siwêdê. Daşgin û hevaleke xwe ya şagirt, kargeriya mamosteya xwe dewr digirin. Piştî ku dibe xwedî kargerî hêj micid li ser karê xwe radiweste û dimeşîne.


**Pêşangeh vekir**

Têkildarî xebata xwe jî Daşgin van agahiyan bi me re parve dike: “Di destpêkê de modelên xwe li ser kaxiz xêz dikim. Lê bi rêbazeke karîkaturî. Piştre jî bi têlan wê modela xwe çêdikim. Heta niha li derdora 30 peyekerên ji têlan min çêkirine. Di hezîrana 2018’an de jî min li Amedê pêşangehek vekir. Eleqeyeke baş ji bo pêşengehê çêbû. Ji xwe ji peyker zêdetir siya peykeran bal dikişand. Jixwe ez jî bi siyê de îfade û wateyê li peykerên xwe bar dikim. Ji bo min a zehmet ev bû: Min ê çi çêbikira? Piştre çêkirina peyker ji bo min hêsan hat. Ku derfetên xwe jê re veqetînim di nav rojekê de dikarim modelek biafirînim.”

**Li ser mîtolojiyê dixebite**

Daşgin dibêje ew rast nehatiye ku li Kurdistanê kesên bi vê hunerê re mijûl dibin lê dibe ku hebin jî haya wê jê tune ye. Daşgina 3 salên dawî hunera peykersaziyê dike, heta niha 6 peykerên bi kilsê jî çêkirine. Lê herî zêde giraniya xwe dide ser peykerên bitêlan. Di berdewama sohbeta me de Daşgin wiha dibêje: “Dixwazim di hunera xwe de bibim pispor û bi profesyonelî bixebitim. Hin projeyên min li ser cerebeyên nû hene. Niha derdora min piştgiriyeke baş a manewî didin min. Dixwazim vê hunera xwe li her derê belav bikim û li her derê pêşangehan vebikim. Di pêşerojê de dixwazim kargeriya xwe mezintir bikim, hunera xwe pêşdetir bibim û şagirtan bi pêş bixim. Gelek kes çîroka vê hunerê û peykerên ku ez çêdikim meraq dikin. Heta niha min wekî modelên navdar; Frîda Kahlo, Salvador Dalî, Jina Guhar Mercan, Monalîza û niha jî Charlie Chaplîn çêkirine. Niha jî li ser motîfên di zarokatiya me de dixebitim. Her wiha li ser mîtolojiya kurdan û hin fîgurên wekî Şahmeran, Melekê Tawis û hwd..”









# Hîna dengê wî zindî ye

48 sal bi ser wefata hunermendê kurd ê navdar Hesen Zîrek re derbas bû. Hesen Zîrek di serdemek gelek zehmet de, bi hunera xwe têkoşînek mezin daye, êş û zehmetiya gelê kurd bi stranan vegotiye. Ji bo wê çendê ye ku piştî 48 salan hîna jî di dilê gelê kurd de zindî ye û ji bo gelek hunermendan jî bûye çavkaniya hunerê.

48’emîn salvegera wefata hunermendê kurd ê navdar Hesen Zîrek e ku ji ber nexweşiya pençeşêrê, bi tena serê xwe li ser textê nexweşxaneyek xatir ji jiyanê xwestibû. Zîrek di 26’ê hezîrana 1972’yan de jiyana xwe ji dest da. Cenazeyê Hesen Zîrek li ser wesiyeta wî li rojhilatê Kurdistan li bajarê Bokan yê parêzgeha Urmiye dispêrin axê.

Hesen Zîrek ê 51 salan jiya, gelek stran çêkirin û li ser radyoyên Iraq û Îranê tomar kirin. Zîrek, yekem strana xwe di sala 1953’yan de li ser radyoya Bexdayê tomar dike û êdî dengê wî sînoran derbas dike. Li Bexdayê nêzî 70 stranên kurdî tomar dike. Li her derê stranên wî tên belavkirin û guhdarîkirin. Piştî sala 1958'an Hesen Zîrek careke din vedigere Îranê, diçe Tehranê di radyoya Tehranê beşa kurdî stranan dibêje. Li ser radyoya Tehranê 39 stran tomar dike. Piştre di sala 1962'yan de peywendî li gel radyoya Kirmaşanê datîne û li radyoya Kirmaşanê 83 stran tomar dike. Zîrek berhemên xwe yên herî baş di wan du salan de, bi rêya orkestraya Kirmaşanê, bi alîkariya mamosta Mucteba Mîrzade tomar dike.

**Stranbêjê gel**

Hesen Zîrek li gelek gund, navçe û bajarên Kurdistanê digere; êş û zehmetiyên gelê kurd bi çavê xwe dibîne. Ev êş û xwezaya Kurdistanê her wiha rojên neteweyî yên kurdan bi gotina stranan tîne ziman. Zîrek reseniya kurdî parastiye û ji herkesê re stran gotine. Ji bo wê ye, tevahiya gelê kurd ji dengê Hesen Zîrek hez dike û lê guhdarî dikin.

**Hezar û 500 berhem**

Hesen Zîrek di tevahiya temenê xwe de, hezar û 500 stran tomar kirine. Her wiha gelek helbestên helbestvanên wekî; Nalî, Wefayî, Seyîd Kamil, Îmamî, Kurdî, Pîremêrd, Hêmin, Tahir Beg Caf vehunandine û xistine stran.

Sirûda bi navê ‘Newroz’ê ku li çar parçeyên Kurdistanê tê naskirin, yek ji berhemên wî yên herî bi nav û deng e ku helbesta Pîremêrd e, Hesen Zîrek kiriye stran.

***SILÊMANÎ***

*Çavkanî: Rojnews*

xwebûn

29 Heziran - 5 Tîrmeh 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 28

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:* İdris Gürmez
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 *Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
Tel:0 (541) 806 84 85

# Welatê Antîakosê zîrek: Komagene[5]

Keştiya Alalû

**Agît Yazar**

...Ji bo em roja xwe nekujin, dotira rojê piştî taştê, em lêdixin diçin tumulusa Qereqûşê. Riya me di nava gundekî re derbas dibe. Ev gundê ji hev belawela û her maleke wê li derekê, li hemberî şaxeke bendava Ataturkê hatiye avakirin. Li pêşiya her malekê, baxçeyên ji gelek cure darên mêweyan heye. Axa zêrîn a bi xêr û ber ya destbela, hemû comerdiya xwe herikandiye reh û rincên darên mêweyan. Ev darên mêweyan, nola jinên ducanî, bedena xwe nû dikir. Darên bi siûd, ji axa comerd xwedî dibûn û ew durrê dayika axê, nola şîrê pêsîra dayikekê, dimijand devê mêweyên li ser guliyên xwe. Ango, devên mêweyan di guhanê darê de bûn, devê reh û rîşalên darê jî di guhanê dayika axê de bû.

Çûkên beytikê li ser guliyên darên tûyan, dikirin şîrreşîrr. Beytikên berkurka xwe ji tûyên şîrîn têr kiribûn, edetî gewî û serxweş ketibûn.

Di nava dêrisê gundê gewre de, duryanek derdikeve pêşberî me. Ji ber ku em gelek caran bi navîgasyonê xapiyabûn û navîgasyonê nola teyrika şevxapînokê berê me dabû ser riyên şaş, em nikarîbûn tam ji ber wê jî amîn bibûna. (tiştekî balkêş e ku heta hişê telefonên zîrek jî, li vî welatî tevlihev dibe û dibe çeqilmast) Loma em çavê xwe li benîademiyekî dipelînin, da ku em rêya xwe jê bipirsin. Li pêşiya me, jineke ciwan ji me ve xuyanî dibe. Hurmetê, pişta xwe daye hêla rê û çêlekên xwe di nav mêrga li kêleka rê diçêrîne. Hevalê me yê ajokar diçe li texma wê dibêje zing û disekine. Rojbixêrekê didê, lê nîvbîstikekê bêdeng dimîne û nola beqên pêjn bi ser bikeve, kurr hildiçine.

Ez vê bêdengmayê miraq dikim û ez serê xwe ji ser telefona xwe radikim. Bi rakirina serê xwe re, ez tavilkê sedema bêdengmayînê fam dikim; qîza 17-18 salî, nola dara selwiyê tîk sekinandî, di ser milê xwe yê rastê re fitilîbû û li hêviya dubarekirina pirsa tênegihiştibûyê, bû. Kirasê wê yê feleknazî yê sorgulî, li ber surra bayê tiral ê bawerzînê, bi nazikî pêl vedida. Şewqa guharê wê, li ser gewriya wê ya nola qirrika qazê, diteyisî. Te yê bigota qey em li qertpostalek ji wan qertpostalên mankenên ku rahiştine satilên şîr û diçin bêriyê, temaşe dikin.

Ez radibim ji qazîka xwe dikuxwînim, da ku hevalan bi xwe vehesînim. Bi kuxîna min a derwînî re, zimanê hevalê ajokar bi peyvê dikeve û bi awayekî fedyok û liberxweketî, dibêje: "xwişkê, gelo ev rê...."

Tomofîla me, nola kêzikekê dabû ser lefekê riya qîra nola lefekê marê reş û ber bi tumulusa Qereqûşê ve dilucimî û pêşve diçû. Heke bernasekî bi baldarî li tomofîla me binêriya, teqez wê têderbixista ku em bi dengê hêla, xwe bi xwe dikenin...

### Tumulusa Qereqûşê

Ev tumulusê hanê, tirba bîrdariyê a çar dotmîr û şahbanûyên şahînşaha Komagene ye. Tê texmînkirin ku ev tirba bîrdariyê ya diya Mîtradateyê 2. Îsîas, xwişkên wî Laodîke û Antiochîs, her wiha birazya wî Aka ye. Ev tumulusê hanê B.Z di navbera salên 36-20'î de hatiye sêwirandin û serdanpê ji kevirên devê çeman û helanê kendalan hatiye çêkirin.

Li ser stûna başûrê tumulusê, teyrê navdar ê ku navê xwe daye vê tumulusê li ser stûnê tunddayî, me pêşwazî dike. Teyr, baskên xwe kokevanî vekiriye, sînga xwe daye gêdûka bayê jêrîn û bi wan awirên xwe yên tûj ziq li paytext Samsatê dinêre.

Li hêla rojhilatê tumulusê, du stûn li kêleka hev in. Li ser stûna hêla jêr, gaboxeyek mexel hatiye û berê wî li hêla çiyayê Nemrûdê ye.

Em dizanin li ser stûna hêla jor jî, şêrek hebûye. Lê heydût û keleşên defîneger, ew zir-peyker ji ser stûnê danîne û hewl dane wî şêrî bidizin. Lê diyar e go ji wan keleş û heydûdan re neserifiye û şêrê gewre li bakurê tumulusa Qereqûşê hiştine. Ez bi êşeke dilguvêşîner li dora şêr dizîvirim. Mixabin, guhê şêr û qismekî rûyê wî yê hêla çepê şikestî ye. Bi humetî ez destê xwe bi wê dera şikestî didim. Mîna meriv birîna pêlewanekî bikewîne, aha wanî bi rêzdarî û ew çend jî dilbirehm tevdigerim.

Hema ji şêrê birîndar wêdetir, ango li bakûr-rojavayê tumulusê, stûneke din jî heye. Li ser vê stûnê, rulyefa Mîtradateyê 2. û xwişka wî Laodîke heye. Herduyan destê hevdu guvaştine. Em ji vê rulyefa hanê têderdixin ku xwişka qral Mîtradateyê 2. Laodîke jî di mava rêveberiya şahînşahiyê de cîh girtiye.

Ev tumulusê hanê, bi destê defînegerên alman û bi ataxiya rêvebirên dewletê, hatiye şêlandin. Lê baş nayê famkirin ka çiqas tişt derxistine û çiqas tiştên ji ber wan filitîne û hîn jî di binê tumulusê de razayî ne.

### Pira Genderê/Cenderê

Em ji tumulusa Qereqûşê derbasî ser pira Cenderê ya 1800 sal berê, ji hêla romayiyan ve hatiye avakirin, dibin. Pira Cenderê, di devê geliyekî kûr de hatiye avakirn û 55 km dûrî Semsûrê, 23 km jî dûrî çiyayê Nemrûdê ye. Ev pira nuwaze, tê texmînkirin yekane pira Romayê ya sipîsaxlem li ser niga ye û li ser çemê Kextayê hatiye avakirin. Pira gewre, Sîncîk û Kextayê digihîne hev. Împeratorê Romayê, Septimius Severus stûnek ji xwe re, yek ji hevjîna xwe re û dudayan jî ji her du kurên xwe re daye nezirkirin. Lê stûnek kurekî wî, ji hêla kurê din ve hatiye rûxandin. Rîwayet ew ku kurên împarator, ji bo textê împeratoriyê bi hev ketine û yekê yek kuştiye. Yê sax, sitûna li ser navê birê xwe yê kuştî hatibû nezirkirin ji binî ve dirûxîne. Loma jî, li hêla Sîncîkê tenê stûnek li ser piya maye.

Pir, 120 metre dirêj e û li ser kemereke 92 bloq kevirên 10 ton giran, hatiye avakirin.

### Kela Kexteyê

Piştî pira Cenderê, berê me li kela Kexteyê ye. Riya me tenê 5 km li ber xwe dide; yek û dudo em digihêjin Kelê. Kela li ser kelateke 300 metre bilind hatiye avakirin û çemek di navbera wê û havîngeha Komagene Arsemiyayê re derbas dibe.

Ji ber restorasyonê, zêde derfet çênabe em baş li nava wê bigerin. Li gorî lêkolînan, temelê vê kela hanê, ji hêla kûmûhûyan ve hatiye danîn. Paşê jî xelkê Komageneyê li ser vê zêde kirine. Kele, cara dawî ji hêla Eyûbî û Memlûkiyan ve hinek beş lê hatine zêdekirin.

Tê gotin ku xelkê hingê yên li vê herêmê, birayê "Osman Xazî" (avakarê dewleta osmanî) yazdeh salan di vê kelê de dîl digirin. (Ez vê agahiya hanê di lênûska xwe ya bergçermînî de qeyd dikim û notekê li jêr datînim, dibêjim: ev mijar, motajî lêkolîneke berfirehtir e)

Ji zindanê bigire, heta hemam, çarşî, mabedên ayînî, embar, qesra qral û gelek avahiyên dîtir jî di nava kelê de hene.

Li vegerê pezkoviyek, tevî du karikên xwe û nêriyek li ser kelata hember li qadraja qamereya me dialiqe. Her du karik, li berpala kelatê ya wek dîwarê kelehê serberjêr, didan lotik û çirtvîrkan; bi çindik, geh dadiketin jêr û geh derdiketin jor. Aqrobat û canbazên li ser şirîtan jî nikarîbûn ew çend xwe li ser wan taht û terrîşeyan hilavêtana. Nêriyê quloç-kevanî jî, nola zanamendekî rûspî li ser pozê zinêr sekinîbû û bi tiralî kayina xwe dikir. Ev dîmenên van ajalên şîrînok û esîl, deriyê cîhaneke kevnar û entîke li ber min vedike; belê. Pezkovî, sembola pêşiyên me kurdan a serê hezaran salan e! Ma ne pezkovî û kurdên reş bin, hed û hudûdê kê ye ku bikaribin di van asêgehan de wanî bijîn?!

Bi vê supriza nuwaze em ji kela Kexteyê vediqetin, dikevin ser rê û dirban. Belê, dîsa berê me li çiyayê Nemrûd, Textê Yezdan e. Derketina ser lûtkeya çiyayê Nemrûdê, ji bo me fînala lêkolînê ye.

Bi hêviya di xeleka bê de, em bi hev re derkevin ser çiyayê Nemrûd û yezdanên li ser qaîdeyan bitewafîne.

Li bendê bin. Ev rêzexeleka nivîsê ya li pêş, rêzexeleka nivîsa welatê Antîakosê zîrek, Komagene ya tewra dawî ye.







